

ARMANC
Ji mehê
carekê
dertê
Hejmar: 80
Gulan
1988
Buha: 10 Skr.
2.5 DM

ARMANC
Monthly
Kurdish
Megezine
No: 80
Maj
1988
Price: 10 Skr.
2.5 DM

Armanc

SERXWEBÜN DEMOKRASİ SOSYALİZM

Girtiyên hefsa eskerî ya Diyarbekir îsal bû
cara duduyan ku dikevin grewa birçibûnê

Girtiyên siyasî bi qerardarî mafên xwe parastin


İdara hefsa eskerî ya Divarbekir xwest ew mafên girtiyan ku
berî du mehan bi zorê stendibûn ji wan pas de bigre. Li ser vê
vekê girtî carek din ketin grewa birçibûnê. Pîstî ses rojên berx-
wedanê, girtî carek din bi ser ketin.

Du pîrejin ji bo ku bala raya gîstî bikşînin ser girtîgeha Diyar-
bekir, li ber belediyê benzîn li xwe kirin û xwe sewitandin.

Hêzên mêtîngîkar sivîl
kirina Hefsa Diyarbekir ya
Eskerî ji xwe re kirin argu-
ment ji bo ku ew mafên
hefsiyan ku du meh berê bi
grewa birçibûnê stendibûn,
paşde bigrin. Girtiyen siyâsî
bi grewa birçibûnê bersiv
dan. Bêyî viya girtiyan dax-
waza rabûna surgûnkirinê jî
kirin. Grewê di 10'ê Gulanê
de dest pê kir. Girtiyen ku
ketin grewê 347 kes bûn.

Roja grewê dest pê kir,
heta roja dawî, mirovîn girtiyan
bi her awî piştgiriya
girtiyan kirin. Lê rojname,
kovar û weşanê din li ser
bûyerên hefsê tu tişt nenivis-
sandin. Roja 16'ê Gulanê du
pîrejin, Salîha Şener û
Rahîme Şahîn ji bo vê bê
dengiyê protesto bikin û
bala raya gîstî bikşînin ser
hefsê, li ber belediya

Dûmahîk r. 11



Salîha Şener xwe dişewitîne.

Di bin êrîş û zordariya rejîma Evren û Ozal de:

1'ê Gulanê hat pîrozkirin

Îsal jî 1'ê Gulanê di bin
êrîş û zordariya rejîma Ev-
ren û Ozal de bi girseyî û
aktîfî hat pîrozkirin.

Wek her salê din ji bo
1'ê Gulanê neyê pîrozkirin
ji alî diktatoriya Enqerê ve
dîsa tedbîr hatin stendin;

polîs û leşkerên xwe sefer-
ber kirin. Lê belê ne tedbîr
û ne jî êrîş û zordariya wan
nikaribû cejna navnetewî ya
karkeran ne de pîroz kirin.

Berî 1'ê Gulanê, li Tirkîyê
û li Kurdistanê grûb û
rexitînen cep pul, afîş û

belavok belav kirin, pankra-
tê bi bombayan diwara dal-
qandin. Û roja 1'ê Gulanê bi
meşen korsanî pîroz kirin.

Li Îzmirê meşvanan gul û
tacegul danin Qonaxa Vi-
layetê.

Dûmahîk r.11



Li Stembolê polîs êrîşî meşvanan kir.

Girtiyen hefsa sivîl a Diyarbekir
mafên xwe bi mîranî stendin

Belevoka Komîta Berxwedana Hefsa Sivîl

Komîta Girtiyen Hefsa
Sivîl a Diyarbekir li ser
berxwedana xwe belavokek
5 rûpel derxist. Nûçevanê Armancê nusxeyek
ji vê belavokê gî-
ha ndin me. Komîta girtiyan
di belavoka xwe de
li ser hovîtiya emperya-
lîzmê, rejima Tirkîyê û
bi taybetî jî li ser hoyen
girtîgeha sivîl a Diyar-
bekirê sekinî.

Komîte di belavoka
xwe de da xuyakirin ku
her hêzên kevneperek jî
bo ku pîsîtiyên xwe ve-
şîn peymanê navneta-
wî yê ku heqê însanan di
parêzên îmze dîkin. Yek
ji vana jî Tirkîye ye.

Komîta Girtiyan ji bo
deşîfrekirina işkence û
hovîtiyên din ê rejima
Tirkîyê û pêşvebirina
tevgera dij-faşîst, gazî he
mû hêz û kesen pêşverû,
demokrat û şoresger dîke
ku ji bo li dijî van ho-
vîtiyan aktîf bixebitin:

Dûmahîk r.11



Roja 13'ê Nîsanê mirovîn girtiyan hatin ber hefsê. Li ser
mudaxala polîs, hînek mirovîn girtiyan hîrs bûn û kevir
avêtin camê Adliyê û hefsê. (Foto: Armanc)

Roja 5'ê Nîsanê 127 girtiyen siyâsî ji bo bi
destxistina hin mafên însanî dest bi grewa
birçibûnê kirin. Hejmera girtiyen ku ketin gre-
wê, roj bi roj zêde bû, gihiş 350'i. Li derive,
mirovîn girtiyan, piştgiriye mezîn nîşan dan.
Grewê 17 rojan dom kir û bi serfirazî xelas bû.

Nûçegîhanê Armancê ji destpêka grewê heta
dawiyê, bûyerên bûyi, roj bi roj qeyd kirin. Em
ji ber gîringîya wê bi kurtayî li jîr pêşkêsi
xwendevanan dîkin.

5 Nîsan: 127 girtiyen siyâsî ji bo hîn mafîn însanî
ketin grewa birçibûnê.

7 Nîsan: Şûbeya Komela
Mafên Mirovatî ya Diyar-
bekir belavokek ji masmedîya
re belav kir, lê deng ji tu
rojname û weşanê derneket.

8 Nîsan: Mahkema hîn
girtiyan hebû, lê tu kes der-
neket mahkemê, vê yekê

bala derva kişand ser hefsê.
Piştî dîtina avûqat û girtiyan,
avûqatê girtiyan da-
xwazan wan, ku ji 14 xala
pêk dihat, ji mirovîn girtiyan
re diyar kirin.

10 Nîsan: Mirovîn girtiyan
ji bo alîkariya pişgi-
riye cûm cem serokê Baroya
Diyarbekir Yilmaz Onen.

Dûmahîk r. 11

Mehmet Şîrîn Tekîn hat bi bîr anîn

Li gelek unîversîten Kurdistanê û Tirkîyê xwendevanan bi
boykota xwarin nexwarinê, bi meşan Mehmet Şîrîn Tekîn bi bîr
anîn.

Par vî çaxî, bi bahana rojî
negirtinê grûbek faşîst û
kevneperek êrîş birin ser
qebla ku xwendevanê şo-
resger lê rudiniştin. Di vê
êrîşî de dilxwazekî PPKK
M. Şîrîn Tekîn şehîd ket.

Îsal di roja salvegera
şehîdbûna M. Şîrîn Tekîn
de li gelek unîversîten li
Kurdistanê û li Tirkîyê tev-
gerên cur be cur hatin kirin.

Li Wanê li Unîversîta Sed
Salî, ya ku M. Şîrîn Tekîn
lê dixwend, li dor 400
xwendevanî xwarin boykot
kirin û xwestin ku bê deng
bimeşin nav bajêr. Piştî ku
qederekî meşyan polîs bi
zorê ew sekinandin.

Li Diyarbekir, xwendevanî
Unîversîta Dîcleyê xwarin
boykot kirin û
meşek çêkirin. Li dij
faşîzmê slogan avêtin û ji

bo bibîranîna M. Şîrîn de-
qekê bêdeng rawestîyan.

Li Unîversîta Stermbolê
xwendevanî xwarin nex-
war û bi slogan meşyan
ber bîna rektoriyê. Li wê
derê dest bi tevgera rûniş-
tinê kirin. Li ser navê
xwendevanî xortek axift.
Di axaftina xwe de got,
"Par, li Unîversîta Sed Sa-
liya Wanê M. Şîrîn Tekîn

Dûmahîk r. 11

Qulûba PEN a Kurd ava bû

Di konferansa navnetewî ya PEN'ê ku di navbera 6 û 9'ê
Nîsanê de li bajare Ingilîstanê Kambriçê çêbû, li ser
pêşniyarekê bi temamiya dengan damezrandina Qulûba
PEN a Kurd hat qebûlkirin.

Berî dengdanê Sekreterê Navnetewî yê PEN'ê Alexander
Blokh nivîskarê Kurd Huseyîn Erdem dawefî axaftinê kir.
Huseyîn Erdem di axaftina xwe de li ser hewcedariya
piştgiriya gelê Kurd sekinî û daxwaza qebûlkirina Qulûba
PEN'ê kir. Ev daxwaz bi kîfxweşî hat qebûlkirin.

Berxwedan Jiyan e

Zindanê Hitler û Saygonê bi wehşeta xwe pirr bi nav û deng in. Lî ev wehşeta li van zîndanan dibû ne di demek normal de bû. Di wan deman de van welatan di nav herbê de bûn. Almanya Hitler di herba duemîn, Vietnam jî bûbû du şeq û di herbek navnetewî û gelek dijwar de bû.

Ji sala 1980'î vir de li Kurdistanê her çiqas gelê Kurd ji bo mafê xwe têkoşînê dide jî, ne herbek û ne jî şerekî çekdarî heye. Lî zîndanê Diyarbekir, zîndanê Hitler û yên Saygonê tînin bîra mirov. A din jî, Tirkîye xwe welatekî Ewrûpa hesab dike û di demeke ku li dînyayê aşîtî heye, faşistîn li ser hukum nikarin wek Hitler û Wan Tî Yo qetşamên mezin bikin, lê bi awakî ku awirêna raya giştî ya dinê bi şikleki tûj neksînîn, ser xwe, işkence û hovîtiyêna xwe bi harîti didomînîn. Hêzîn mêtîngîhkar di zîndanê Diyarbekir de bi deh hezaran mirov ji işkencen hov derbas kirin, girtiyen welatperwer di şertîn qirêj û pîs de, di nav her cure nexweşînî de dan jiyandin. Erê bi hezaran însan qetil nebûn, lê bi hezaran însan nîvsax, seqet hîstîn. Bes bi lêdan û işkencî li dora 50 kesî kuştin.

Qetîkirina 50 kesî ne tenê wehşet û hovîtiya dijmin dide eşkerekirin, ev her wisa serî netewandina têkoşînîn lawêne Kurd jî dide nîşan dan. Girtiyen siyasi qet tu demê baweriya xwe ya paqîj û bilindîn wînî û nekirin û teslimî dijmin ne bûn. Li gor şert û mercan li ber xwe dan, şeref û heysiyeta xwe û tevgera şoresgeriyê parastin. Gelek caran, bi deh rojan ketin grawa birçibûnê. Bi zorê, bi qewet û irada xwe ya şoresgeriyê mafê xwe parastin. Girtiyen siyasi baş dizanîn ku li hember neheqiyê serî tewandin, ne tenê mirov pê heqê xwe winda dike, li gel vê mirov ji şeref û heysiyeta xwe jî dive.

Girtiyen siyasi ne bes ji bo ku heqen xwe bi dest xin, li ber xwe didin, ew her wisa bi van tevgeren xwe dibin çîrûskek têkoşîna gelê Kurd a giştî jî. Belavoka Komîta Hefsa Sivîl jî dide xuyakirin ku ew di vê zanînî de ne û li gor wê jî hereket dikin.

Ji serê salê vir de ye ev bû 3 car girtiyen hefsa Diyarbekir dikevin grawa birçibûnê; du caran hefsa eskerî û carekî jî hefsa sivîl. Hemû liberxwedan jî bi serfîriya girtiyen derbas bûn.

Serkeftina wan, yek ji yekîtiya wan, dudu ji qerardariya wan, sisê ji piştgiriya xurt a li derveyî hefsê û di serî de jî ji piştgirtiya mirovîn girtiyen tê. Li dor 50'î şehîd dayîna wan qerardariya wan dide xuyakirin. Ji xwe li ser yekîtiya wan jî ne hewcîy gotinê ye.

Lê, fedakariya di bin jopê polis û dîpçikêndirman de, di serî de jî dê û xwişkîn me, ew piştgiriya ku xelkê me dike hêjâyî her methê ye. Bê tîrs, bi qerardarî, bi çepik, bi stran û lîrandin. Belê roja 16'ê Gulanê dema me ji bînaya SHP'ê re telefon vekir, dengê lîrandin û kîlamân dihat guhê me.

Ya din jî çaxa diya Salîha û Rehîme li kîleka Çarşıya Şewîti, li ber bîna belediyê bê dudîlî dema benzîn bi ser xwe de kirin û agir bera xwe dan, hêzîn kolonyalist li hember vê qehramaniyê xwe şasî kirin, mit û mat man û wek ku ji wan dihat payin cardin dest bi hovîtiya xwe kirin; her du dayikêna qehraman jî girtin avetiñ zîndanê. Lê belê têkoşîna gelê Kurd gîhîstiye wê merhelê, ku êdî tu zîndan nikare pêrgîyê lê bigre. Dijmin, zû an dereng wê vê rastiyê bi çavê serê xwe bibîne.

Adresa me hat guhrandin.

Adresa me ya nuh ev e:
P.R S-172 06 Sundbyberg
Sweden

Adresa Jîna Nû her wek xwe ye:
P.Box: 240 12
750 24 Uppsala
Sweden

İfâda M. Şêxmûs Cibrân

**"HEGER EZ CAREK DIN BIHATAMA DINYAYÊ
EZÊ DÎSA JÎ BIBÛMA ŞOREŞGER"**

4

"Heger bi navê demokrasiyê hinekên ku mahkeme bibin hebin, ew jî ne em in, ew in"

Piştî ku burjuwaziyê Tirk li ser axa Tirkîye û Kurdistanê hukum xist destê xwe mafê gelê Kurd û yên eqalîyetîn din da alîkî, bi welatê emperyalîst-kapitalîst re li hev kir û di sala 1923' an de Peymana Lozanî hat imzekirin. Li gor wacibîn vê Peymanê Kurdistan bi bû çar perçan û ji alî çar dewletê kolonyalist ve hat parvekirin. Kurdistan ku bêyî irada xelkê wê perçe bû û bû koloniye klasîk, bi kedxuriyê, zulmî û siyaseten dûvikî ket bin dest. Ev yek bû derbak mezin li hember rewşa pêşveçûna Kurdistanê ya aborî, civakî û kulturî. Burjuwaziyê Tirk ê kolonyalist li Kurdistanê bi qismekî hêzîn serdest re kete tifaqê û di seran-serê dema îlhaqa aborî-siyasî de li ser gelê Kurd zor û tada nîjadperest û şoven gelek zêdetir kir. Hebûna netewê Kurd ïnkar kir û siyaseta xwe ya asîmîlasyonîst(bîsaftînî) kir polîtîkek dewleta Tirk a resmî. Zimanê Kurdî, Kultura Kurdî, sin'et û edebiyata gelê Kurd bi tedbîren gelek sert hat qedexekirin û hat tahrîbkirin. Bi kurtayî ji bo qirkirina gelê Kurd demek terorê hat meşandin û hîn jî dom dike.

Gelê Kurd dem dem, teşebusî serî-hildanê çekdarî kiriye. Di 1921'ê de Koçgîrî, di 1925'an de Şêx Seîd, di 1928-1930'an de Agrî û di 1937-38'an de Dêrsim. Vana serîhildanê ku di vê tarîxa nêzîk de hatine meydanê. Lê belê ji ber pasdemayina merhela netewî û fîkrê netewî, bûyîna pêşengîya tevgeran jî hêzîn feodal û burjuwa û ji ber mayina di sînorekî meheli de burjuwaziyê Tirk ê kolonyalist her carê, van tevgerana di xwîn û agir de feti-sand û şikand. Û her serîhildanek ji bo gelê Kurd bûye sebebekî nuh ji bo qirkirin û surgûnên bi girseyî. Netîcîn tal ên van qetşamên ku rûreşîya hemû merivatîyêye di celseyên dizî yên Meclîsa Tirkîye (TBMM) de hatine dîtin. dema hewcîyî dayina mînakekî be, çaxa zebtên di derheq Serîhildana Koçgîriyê ya 1921'ê de (TBMM civîna 85' an 3 Çîriya Pêşî 1921 kombûna 1'ê) bên tetkîk kirin wê mezinayıya wahşetî ji devê parlamenteñer bête bihîstîn. Van belgena di kovara Saçak hejmara 39 de hatine weşandin.

Piştî şerê rizgariya netewî, li Tirkîye, kapitalîzm bi destê dewletê bi lez pêş de çûye. Tirkîye di warê aborî, siyasi û leşkerî de bi emperyalîzm ve hatîye girêdan, bazara Tirkîye ji ser-mîyanî biyanî re vebûye û jê re keda erzan hatîye temînkirin. Dewlementiyen ser erd û bin erd ji talana monopolan re vebûye û welat her roja ku derbas bûye bêtir bûye tabîe emperyalîzm. Li gel bi destxistina azadiya siyasi ya qîsmî, hemû çavkaniyê aborî yên wehşet pêşkîşî bin emrê monopolen biyanî bûye. Bi derba leşkerî ya 1960'î re di wê rewşa demokratîk de, ku Qanûna Esasî ya 1961'ê anîbû, tevgera çîna karkir xurt bû. Sewiya

şiyarbûnê zêde bû, li gel vê, zelalbûna sinifî bi lez pêş ve çûye. Bi gelempîrî li Tirkîye û li Kurdistanê organîzebûnîn siyasi, demokratîk û sendikayî gi-hîstîn merhelîn hîn mezin. Bi parelliya viya re li Kurdistanê û li Tirkîye muxalefeta civakî zêde bû.

Ji bo ku ji buhrana aborî û siyasi bête derketin û muxalefeta civakî bête pelçiqandin di 12'ê Adara 1971'ê de derba leşkerî ya kolonyalist a faşist hat çêkirin. Ü vê mudaxela faşist a leş kerî demek zulm û zorê da jiyandin.

Ji ber qerekerê burjuwaziyê kolonyalist, monçopolist ku tim girêdayî emperyalîzm ye di orta salên hefteyî de ji bo ku ji buhrana aborî û siyasi ku carek din kûr bûbû xelas bin û ji alî din de jî ji bo ku ew muxalefeta netewî û sinifî ku li Kurdistanê û li Tirkîye pêşde diçû ji ortê rakin carek din jî ji mudaxeleyek faşist a leşkerî re hewcedarî hat dîtin. Ü bi vê armancê derba 12'ê Îlonê ya faşist a leşkerî hat çêkirin. Ordiyê, li gor daxwaz û menfe eta emperyalîstan û hevalbendê wan dest da ser hukum. Hemû muessese û qanûnîn demokrasiya burjuwazî rakin refê, meclîs fesh bû û Qanûna Esasî ya 1961'ê îptal bû. Hemû hukum, infaz û qanûn di destê diktatoriya faşist a leşkerî û hevalbendê wê

Li welatekî ku mekanîzma dewletê di emir û insîyatîfa Emerîka de be, ji cumhûriyetek demokratîk bahskirin ji însanîyet û ilim re heqaret e. Îdara dewletê qet di tu demeke dîrokê de hewqasî keyfi hereket nekiriye, ji huqûq û qanûnan re bi vî rengî bê hurmetî nebûye. Heger bi navê demokrasiyê hinekên ku mahkeme bibin hebin, ew jî ne em in, ew in. Bê şik berî ku ev derba leşkerî ya faşist çêbibe şertîn wê yê maddî cardin ji alî emperyalîstan û hevalbendê wan ve hazir bû. İstîxbarata DAY CIA û dûvikîn wê yê li Tirkîye MîT, Kontr-Gerilla, MHP (Partiya faşist) û ji alî hevalbendê wan ve komplô çêbûn, li welêt anarşî, teror pîj kîrin, dijayediyen ziman, mezheb û dijayediyen eşîrî kûr kîrin û bûn sebebê kûrbûna buhrana aborî û siyasi û di vî wařî de li hember hukûmetê gelek entrîka pilan kîrin. Lî hemû rêxistinê demokratîk û siyasi, sendîka, bi xerakirina dûzana mewcûd bi şikleki çekdarî ya jî bi hin riyîn din û ilga kîrina meclîsa Tirkîye û di dewsâ wê de jî bi anîna dûzanek sosyalist îtham bûn û bi maddeyîn 141, 146, 125'an hatin mahkemekirin. Ji hefsê bigre hetanî mirinî bi sedan kes mahkûmî cezayîn cûr be cûr bûn. Daxwaziya van a

Li welatekî ku mekanîzma dewletê di emir û insîyatîfa Emerîka de be, ji cumhûriyetek demokratîk bahskirin ji însanîyet û ilim re heqaret e. Îdara dewletê qet di tu demeke dîrokê de hewqasî keyfi hereket nekiriye, ji huqûq û qanûnan re bi vî rengî bê hurmetî nebûye.

de ye. Diktatoriya faşist di demek kinde, di nav hemû muessesen dewletê de organîzebûna xwe qedandiye, terora dewletê ya giran li ser hemû tebeqênen gel bi hawakî bê aman dide meşandin. Dewlet, wekî ya nêzî 600 salen di dema Osmaniyan de, bi keyfiyetek nedîti hatîye meşandin, gava gel di bin fecîfî û zulmî de naliyaye holdingan ji demen xwe yê herî bas jiyane.

Li vir dixwazim balê bikşînim ser rewşek huqûqî. İro li Tirkîye û li Kurdistanê diktatoriye leşkerî ya faşist (rêzek nehat xwendin)... derê gerandin bes acîzî û serî tewandin e.

Van hêzîn ku Qanûna Esasî û Meclîsa Mezin a Milet a Tirkîye ji ortê rakirin idara dewletê girtine desten xwe û fatûra buhrana aborî û siyasi jî bi şoreşeran, demokratian, ronakbiran, karkir û kedkaran dane dayîn. Ü bi fatûrayê re (hesab re) van hêzana bi xerakirina dûzana mewcûd û bi teşebusa ji ortê rakirina MMT'E mahkeme bûne û bi hezaran cezakirine. Xwedîgiravî viya ji bo parastina cumhûriyet (rêzek nehat xwendin)... Qanûna Esasî ya 1981'ê imkanek wisa zêde nade qet tu hêzê. Ji wê jî bikeve, cumhûriyet ketiye ci halî li ortê ye.

dûzanek hîn demokratîk, hîn însanî û hîn adil, sûc qebûl bû(hesibî). Wek hûn jî baş dizanîn ku pirranya van rêxistinê demokratîk û siyasi: daxwaziek wan a wek xerakirina meclîsa Tirkîye û rakirina Qanûna Esasî tuneye. Qet yekî jî tiştekî wisa nekiriye. Li gel ku tiştekî wisa nekîn jî, ji vî sûcî ceza bûn. Yê meclîs fesh kir, Qanûna Esasî bi zora sîlehî ji ortê rakir ew kesen ku derba leşkerî ya faşist pêk anî ne. Heger hin kesen ku divê ji madda 146'an û.y.d. bên mahkeme hebin, li gor qanûnan vana ne. Wê çaxê ev tê wê manê, kîjan hêz bixwaze Qanûna Esasî, Meclîsê (MMMT) ji ortê rake, lê ji heq neyê der, ew cezayê ku heq kîriye wê bibîne; lê ji heq derkeve, Qanûna Esasî û Meclîsê bi zora sîlehî ji ortê rake, wê çaxê bila cezakirin jî li wir bimîne heqî idara welêt jî digre. Li vir sûc, bisernekît e. Yanî dixwazim bîbîjîm, heger bi maddeyîn jorîn wê hin kes mahkeme bibin ew jî idara leşkerî ye. Ji ber ku yên Qanûna Esasî, hemû muessesen demokratîk û meclîs ji ortê rakirin vana ne. Sûcdañan li ciyên (rêzek nehat xwendin)... Cardin ji alî van hêzîn tarî ve hatîye pêk anîn.

Dûmahîk di hejmara bê de

Adres : Armanç
P.R S-172 06 Sundbyberg
Sweden

Adresa Jîna Nû her wek xwe ye:
P.Box: 240 12
750 24 Uppsala
Sweden

Adres : Armanç
P.R S-172 06 Sundbyberg
Sweden

Sertîn Abonetiyê:
Salek 120 Skr, 30 DM.
Şeş meh 60 Skr, 15 DM

Ansvarigutgivare:
Kurdiska Demokratiska Arbetar Unionen
Postgiro: 50 37 99-9, ISSN: 0384 7385

Protesto li hember qetliama Helepçê dom dike

Almanya Federal: Di ser 20 rîxistin û komelên Kurdan yên li Almanya Federal, komîteyek bi navê "Komîta li hember bikaranîna çekêñ kîmyayî li Kurdistan Iraçê" sazkirin. Federasyona Komelên Karkerê Demokratê Kurdistanê li almanya federal (KKDK) jî di nava vê komîte ciye xwe girt.

Komîte belavokek û plakat bi zimanê Almanî derxist. Ew li hemû derî belav kir. Li gelek bajarê Almanya Federal, wek Berlin, Köln, Bonn, Hamburg, Bremen, Celle, Dortmund, Bochum, Nûrn-



Bîstek ji mitînga Bonnê (Foto: Armanc)

berg, Ludenscheid û h.w.d. li zêdeyî 50 bajarê Almanya bi meş, bi mitîng û bi tevgerên cur be cur qetliama Helepçê hat protesto kîrin. Bi partî û rîxistinê mafê miravan diparêzin re hat rûniştin. Komîte ji wan xwest ku ew vê qetliamê protesto bikin û piştigîriya xwe a maddî û manewî bi rûniştevanê Helepçê re bikin.

Di roja 9'ê Nisanê komîte li bajare Bonnê mitîngekeke merkezî li hember qatliama Helepçê çêkir. Ji hemû quncen Almanya Federal Kurd hatin tevî mitîngê bûn. Zêdeyî 2500 mirovî bi devekî digotin; bimre Saddam bijî Kurdistan. Partîya Keska, Partîya Sosyal Demokrat (SDP), Partîya Komunîst, Civaka ji bo Mafê Gelê Bin-

dest (GFBV) û Medico Înternasional piştigîriya xwe şanî dan.

TV, Radyo û Rojnaman cî dan tevgerên protestoyên Kurdistan yên li hember jenosida Helepçê.

Di 25'ê Nisanê de Komîte, bi merkeza Partîya Keska re li Bonnê axaftinê çêkir. Partîya Keska soz da ku wê di Meclîsa Almanya Federal de Aktuele Stundê (seetek ak-

tuel) çêkin û bi tevayî li ser qetliama Helepçê biaxivin.

Di roja 6'ê Gulanê de li bajare Essenê Partîya Keska, Keskê Alternativ, Yekîtiya Humanîstan û Civaka Xwendevanê Protestanta bi hev re civînek li ser qetliama Helepçê çêkirin. Filîmê ku Kamil Taylan û M. Hafner li ser qatliamê çêkiribûn nîşan dan. Ev qetliam

riswa kîrin.

Swêd: Di 14 û 15'ê Nisanê de Komelê Demokratê Jinê Kurdistan li merkeza Stockholmê li dijî qetliama Helepçê imze topkir, pere civand û raxistîne vekir. Van xebatên Komelê gelekî bala Swêdîyan kîsand.

□

Bi Kurtî

Şam (Sûriye): Roja 21'ê Nisanê hunemendekî Kurd ji Kurdistan Iraçê bi navê Nezîr Xêlânî afirandinê xwe li Merkeza Çand a Sovyetê ya li Şamê raxist. Raxistina wî nêzîkê ji 130 perçan pêk hatibû. Afirandinê xwe piranî ji daran çêkiribû, bêyî van, hin ji hestiyâ, hin jî ji keviran çêkiribû. Nezîr Xêlânî di tîmsalên xwe de têkoşîna gelê Kurd dabû xuyakirin. Ji van berheman çend heb jî li ser serîhîdana gelê Filistîn bûn. Raxistinê geleki bala temâşevana kîsand.

Stockholm (Swêd): Di roja 23'ê Nisanê de Malmîsanij li ser "Tarîxa Sirgûnbûna Kurda li Kurdistan Bakur" semînerek da. Semîner ji alî Komela Kurd li Stockholmê ve hatibû organîzekirin. Li dora 70 kesî di civînê de besdar bûn.

Stockholm: 23'ê Nisanê Komela Kurd li Botkyrka ji bo alîkariya girtiyêni siyasi yên Kurdistan Tirkîyê amade kir. Di programa şevê de Feqiyê Teyran, Gulistan, Birîndar, Rizgar, Koma Kurdistan û koma govenda zarakan hebûn. Di şevê de li dora 400 kesî temâşevan besdar bûn.

Stockhom: Di Roja Navnetewî ya Nan (24 Nisan) de Komela Demokratik a Jinê Kurdistanê jî bi nanê Kurdî besdar bûn. Li Muzeya etnografîyê nanê gelek netewan hat nîşan dan. Li gor zanîna me ev cara yekem e ku nanê Kurdî rojek weha navnetewî de tê nîşan dayin.

Stockholm: Di 30'ê Nisanê de Ordîxanê Celîl semînerek li ser "Jiyana Kurdê Sovyet" da. Mamoste Ordîxanê Celîl bi firehî li ser jiyan û pêşveçûna Kurdîn Sovyetê sekinî. Semîner ji alî Federasyona Komelên Kurdistanê ve amade bûbû. Di semînerê de 200 kes besdar bûn.

Stockholm: Di roja 8'ê Gulanê de li Stockholmê ji alî Komela Kurd li Stockholmê şeveke helbestvana hat amadekirin. Di şevê de Muayed Teyib, Hemê Saîd Hesen, Xelîl Dihokî, Asî Rebatî, Mehîfûz Mayî, Silêmanê Qasîmyanî, Rizgar Ebdulah, Malmîsanij, Alan Serdeşti, Emîn Sindî û Azad helbesten xwe xwendin. Li dor 150 temâşevanî bi heyecan helbest guhdarî kîrin.

Stockholm: Di 14'ê Gulanê de hunermenê Kurd Fexreddîn Gerdî li ser "Folklor û Stranê Kurdî" semînerek da. Ev semîner jî ji alî Komela Kurd li Stockholm ve hat amadekirin.

Divê ku hukûmeta Bonnê Kurdê li Almanya Federal dijîn wek grûbek netewî û cihê nas bike

Di 28 û 29'ê Nisanê de li bajare Cellê Wezîrê Karê Hundir yên eyaletê û Wezîrê Karê hundir yê Almanya Federal ji bo politika xwe ya li ser biyanîyan û multecîyên li Almanya Federal ji nuh ve tespit bikin, konfarensek çêkirin.

Mirov bi rehetî dikare bibêje, ku li Almanya Federal heqê biyanîyan pîrtune ye. Lê Wezîrê Karê Hundir yê Almanya Federal Zimmerman van heqên heye jî ji biyanîyan re zêde dibîne û lewma dixwest di vê konfarensê de van heqên heye jî birûcikîne.

Li dijî politika Zimmerman rîxistin û komelên Tirkan, Kurdistan, İranîyan û gelek rîxistinê Alman roja 28'ê Nisanê li bajare Cellê meş û mitîngek çêkirin. Zêdeyî 1500 kesî tevî vê mitîngê bû.

Li ser navê biyanîyan axavtin hatin kîrin. Bi navê Kurdish serokê KKDK axivt. Pişî ku ew li ser mesela biyanîyan bi teveyî sekinî, ji bo pirsa Kurdê li Almanya Federal dijîn û rûdînin jî viha got. "Îro li Almanya Federal zêdeyî 350 hezar Kurd rûdînin û kar dîkin. Em Kurd jî wek hemû kesî vêrgiya xwe didin dewleta Almanya Federal. Keda me jî di pêşveçû

na civaka Alman de heye. Kesek pênc pere belaş nade me Kurdish. Bi kurtî em nan û ava xwe bi xwêdana enîya xwe qezenc dîkin. Lê belê hukûmeta Almanya hebûna me Kurdish li Almanya Federal qebûl nake. Ew, me ya wek Tirkan, ya wek Ereban, yan jî wek Farisan dihesbîne. Lewma jî heqê dane biyanîyan din (Tirk, Yugoslaw û h.w.d.), her çiqas ku ev heq hindik bin jî, naxwaze bide me Kurdish. Ji bo hukûmeta Bonnê tu dibê qey em Kurd kurê dêmâriyê ne. Heta di warê nufûsê de jî, Almanya Federal nahêle ku em navê Kurdî li zarokêne xwe kin. Bê şik sebebê vê neheqîyê, ji girêdan û hevalbendiya Almanya Federal bi dewleta Tirk, İran û Iraqê re ye. Doh bû ku hukûmeta Iraqê 5000 kesen bê sûc û bê guneh bi çekêñ kîmyayî li Kurdistan Iraçê, li bajare Helepçê qetil kir û 7000 kes jî birîndar kir. Lê hukûmeta Bonnê qe nebe ev yek, bi mektûbekê jî protesto nekir."

Serokê KKDK daxwazên Kurdê li Almanya Federal dijîn ji bo hukûmeta Bonnê wiha rîzkir: "Divê ku Kurdê li Almanya Federal û Berlîna Rojava dijîn wek grûbek netewî a serbixwe bê naskirin. Ev yek tê vê manê:



Bîstek ji meşa Cellê

1-) Divê ku di radyo û televîzyona Almanya Federal de weşanên bi zimanê Kurdî bêne weşandin.

2-) Divê ku zarokê Kurdish di mektebê Almanya Federal de karibin wek biyanîyan din zimanê diya xwe, kultur û dîroka xwe bixwînin.

3-) Divê ku heqê şêwra sosyal bi zimanê Kurdî ji bo Kurdish jî bê qebûl kîrin."

Li Diyarbekir 5 Komel

Pişî 12'ê Îlonê, dîktatoriya faşîst hemû komelên demokratik û pêşverû girtin, serok, berpirsyar û endamên wan avêtin zîndanan. Bi zor û bi qeweta tevgera şoreşerî, ji nuh ve hazırlîya avakirina komelên demokratik û pêşverû têne kîrin. Li Tirkîyê di van du salên dawiyê de bi dehan komele hatin avakirin. Herçiqas dîktatoriya faşîst bi vê yekê neraziye jî, mecbûr dimîne rî bide avakirina komelên demokratik û pêşverû.

Lê li Kurdistanê dîktatoriya faşîst hîn hişkîr û mirûz tal e. Qanûna Esasî ya Tirkîyê de resmiyetê de ji bo Kurdistanê ye jî, lê di praktîkê de ev her ne wisa, ye. Ev yek di avakirina komelên demokratik û pêşverû têne kîrin. Li Tirkîyê di van du salên dawiyê de bi dehan komele hatin avakirin. Herçiqas dîktatoriya faşîst a mêtîngîkar ku derdixe pêşîya xwendevan û ronakbîrê Kurd jî bi kêt nayê. Di têkoşîna rizgarîxwaz a gelê Kurd de wek her cure xebat, şoreşerî û welatparêzên Kurd bi 'ezim û bi biryar in ku xebata komelayetî jî bikin.

Pişî xebatek dûr û dirêj xwendevanê Fakulta Huqûqê ya Uniwersîta Dîcleyê bi navê Komela Xwendevanê Fakulta Huqûqê komelek vekirin. Ev serê çend mehan e ku komele ava bûye, lê hêjî ji alî Federasyona Komela Fakulteyê ve komele bi resmî nayê nas kîrin. Xwendevanê Fakulta Fenê jî ji bo avakirina komelekê her formalîte bi cî anîne, lê polîs her roj, bendeke nuh derdixe pêşîya wan û dixwaze avakirina komeleke weha bi derengî xe. Xwendevanê Fakulta Tibê jî her weha di haziriya avakirina komelekê de ne.

Ronakbîr û awuqatên Kurd ên pêşverû û demokrat pişî xebatek dirêj komelek bi navê Komela Mafê Mirovî ava kîrin. Meriv û nasen girtiyêni siyasi yê Diyarbekir jî dixwazin komelek girêdayî Komela Mafê Mirovî ava bikin.

RANANÊN RAMANWERAN

Çekêñ Kîmyayî

Dr. Behram Resûl

Mirov dikare bejê dîroka çekêñ kîmyayî ji sala 1770'yi de dest pê dike. Ji ber ku cara ewil dermansazekî Swedî bi navê Sheele; Klor (CL2), hidrojen-sîyanîd (HCN) û arsînîk (AS) keşif kîr. Paşê di sala 1850'ni de gaza tabûn û di sala 1886'an de ji gaza xerdelê hat icadkirin.

Çekêñ kîmyayî bi awekî giştî di navbera 1914 û 1918'an de di Herba Cîhanê ya Yekem de hatin bikaranîn. Di sala 1925'an de Cemiyet-î Akvam bikaranîna van çekana qedexe kîr, lê dîsa jî ji alî rejîmîn wek Iraqê kevneperest û faşist de têbikaranîn.

Li gor raporeke Neteweyê Yekbûyî çekêñ kîmyayî ji her madeyê kîmyayî bi şıklê rohn, hişk û gaz pêk hatine. Armanca çêkirina van çekan, bi kuştinê ji holê rakirina însanan, heywan û rûwek (gîha, çandî, dar û ber) e. Yan jî zîyan gihaştandina mirovan e. Çekêñ kîmyayî, li gor tesîra xwe ya li ser însan, heywan û gîhayê sê babet in:

A-çekêñ kîmyayî yêñ kuşinde

Ji wan ên herî bi talûketîrîn bi navê "çekêñ Kuşinde" têbikaranîn û ew jî di nav xwe de sê bes in:

a-) Jehra toksîn (toxins): Ev jehra ji organîzmaya wîrd û rûwek têtê girtin. Ji proteînên kompleks durust bûye. Di laboratûwaran de nayê çêkirin. Di şerê biçük de têbikaranîn.

Mirov dikare bêje kujiholêrakirina tesîra wê jehrî mumkîn nîne.

b-) Jehra sinîr (Nervgas): Ev gaza tesîrî li ser sistêma sinîr dike. Bi şıklê rohn têbikaranîn. Wextê ku têbikaranîn, tevilê dibe buxar û belav dibe. Ku mirov di cîh de çareser neke mirov pê dimire.

Nîşanên tesîra vê jehrî ev in:

- 1- Ji devê mirov ecêb lîk (girêz).
- 2- Ronahîya çavan giran dibe û ji çavan hêşir têb.

3- Nefes stendin û girtin giran dibe.

4- Masilke (muskel) topî ser hev dîbin, bê hêz dîbin, hişk dîbin, dilerizin û ji taqet dikevin.

Ku ev jehra têkeve nav xwînê, masilke hîç wezife nabînin. Û êdî mirov nikare destava xwe bigre.

Ku ev jehra bi wesîta çerm têkeve nav xwînê, di navbera seetekê û rojekê de tesîra xwe dide xuyakirin. Lê ku di riya dev û poz re têkeve nav xwînê tesîra xwe tavilê dide xuyakirin û di nav 4-5 deqîqan de mirovan dikuje. Tesîra vê gazê girêdayî dozaja wê ye.

Li dijî vê jehrî derman heye, lê dîvî derman zû bêbikaranîn. Derman se-reke bi enjektorê têşirgekirin. Bikaranîna vê derziyê pir hêsan e, herkes dikare bi kar bîne.

c-) Jehra çerm birîndarker (Blistering Agent). Ev jehra tesîrî li ser çermî derve dike. Wek dest, ling, rû û cav. Ku bikeve ser cilan, ji vir hêdî hêdî derbasî nav can dibe.

Ev gaza cara yekem di sala 1987'an de rejîma Saddam a faşist li Kurdistanî. Cara duymen jî dîsa li Kurdistanî, li Helepcê bi kar anîn.

Xususiyeta vê jehrî ev e ku pir bi xeter e. Eger bi wesiteya bîhngirtinê têkeve nav laşê mirovan tavilê dikuje. Bi awayen din tesîra xwe zû bi zû nade xuyakirin. Ji bo hîskirina tesîra wê ji

sê seetan heta rojekê zeman divê.

Bêtir tesîrî li ser çermî nazik dike. Wek dorhêla çavan, bin pîyan, rû, navşeqan û çermî zarokan.

Ku bikeve ser çavan û zûNEYE şuştin, çavan kor dike. Çavan dixurîne, hêşiran tîne, diwerimîne. Tesîra vê jehrî heta çend salan jî ser çavan winda nabe. Çav nazik dîbin û li dij nexweşîyan bêhêz dikevin.

Ev gaza wek agir çerm dişewtîne. Birînên vê jehrî wek birînên şewatêne. Ji xwe tesîra xwe bi sorbûn û şewata çerm dide xuyakirin.

Wek nervgazê zû belav nabe. Ji ber ku bi şıklê rohn têbikaranîn û girantir e. Zû dikeve erdê.

Li ser çerm pelqikêne tije av peyda dîbin. Bi derbûna wan pelqikan laş avê winda dike. Li ser laş tesîra vê jahrê xwe di sê qonaxan de dide xuyakirin.

Di qonaxa yekemîn de çerm sor dibe û pelqikêne biçûk peyda dîbin. Di qonaxa duymen de çerm sortir dibe, renge çerm tê guhartin û pir diêse. Di qonaxa sîyemîn de çerm diqeliş, naşîrîn dibe û diweş. Di vê qonaxê de dermankirin zor zahmet e.

Tedewîya jehrîn çermbirîndarker

Tedewîya birîndarêne vê jahrê wek tedewîya birîndarêne şewatêye. Çiqas zûtir çermî li ser birînan ji vê jehrî bête paqîjîkirin hewqas birîndar zûtir ji vê jehrî xilas dibe.

Tedewîya herî baş bi ava paqîş şuştina çavan û temamê laş e. Pişti bi sabûnê paqîş şuştina laş, divê mirov bi temamê laş ard werke (biresîne) ku ard jehrî bikşîne. Paşê dîsa divê bi ava sar û sabûnê laş betê şuştin.

Çekêñ kîmyayî yêñ mirov jihêzxistinê

Ev jahr dijmin di meş û mitîngan de li dijî gel bikar tîne. Wek bikaranîna dewleta Îsraîl li dijî gelê Filîstînê. Ev jahr tesîrî li mîjî dike. Wek gaza hêşiran ji çavan hêşiran tîne. Tesîrî li ser sistêma nefsegirtinê ji dike. Cure kî din yê vê jahrê heye ku dijmin dixe nav tişîn xwarinê û bikar tîne. Tesîra vê cüreyê wek tesîra tişîn nar-kotîk e, angô wek tesîra xaşxaşê ye. Mirovan serxwêş dike. Tedewîya vê jahrê mumkîn nîne.

Hidrojen-Cîyanîd (HCN)

Tesîreke mezin li ser hemoglabîn dike. Rê li oksijen digre ku têkeve nav laş. Ev gaza bi jahr mirovan tavilê dikuje. Kesênu ku di cî de nemirin êdî namirin.

Reng û bîhna vê gazê tune. Tahma wê wek tahma behîvîn tahl e. Bi tesîra vê gaza bi jahrîn, serê mirov gêj dibe, mirov vedirse, lêv hişîn dîbin, nefes tê birîn û mirov dimire. Ku di deqîqa ewil da mirov nefsegirtina sunîn bide birîndar, angô oksijenê bide nexweş, mumkune ku xilas bibe.

Bikaranîna çekêñ kîmyayî

Çekêñ kîmyayî bi gelek hawayî têbikaranîn. Wek tozê têbikaranîn, wek avê (rohn) têbikaranîn û wek gazê têbikaranîn.

Toza çekêñ kîmyayî ji ard hûrtir e. Ji ber wê dîtina wê gelek zahmet e. Wextê ku tê pijiqandin mina ku ewrek xuya bike.

Bi awayê rohn wer bi tazyîkeka mezin tê reşandin ku dibe wek hilim (mij, keldûman). Bi çava dîtin dîsa ne mumkun e.

Ev gazen bi jahr, bi wasita hemî çekêñ hesinî têbikaranîn. Wek top, hewan, narincok (bombê destan) firoke...

Di kîjan rewşa hewê de bi tesîrtir in?

Di roja navbera 35-40 dereca germ, hişk, bê ba û bê ewr de ku bêbikaranîn bi tesîrtir in. Ba dikare berê gazê biguhere û bibe ser dijmin û baran zû dixîne erdê û bêtesîr dihêle. Ji bo wê dijmin di roja ku ba tê van çekana bikerayne.

Di deqîen ewil de nîşanên bikaranîna çekêñ kîmyayî çîne?

Berî bikaranîna van gazan dijmin bi firokê keşif dike ku gel li ku pirtir e. Paşê bi firokeyen bombardimanê hêris dîkin û bombayen kîmyayî berdidin. Ku gel firokeyen keşif dîtin, divê bîzanibin ku dijmin hazırlîya êrîş dike.

Ku di rojeke sayf de firoke hatin û paşê li esman ewir peydabûn û çav xwîrsyan û mirovan xwe bêhêz his kir û bîna şewatê hat, divê mirov bîzanibe ku çekêñ kîmyayî hate bikaranîn.

Li dijî çekêñ kîmyayî xwe parastin

Demamik (Maske): Li dijî gazen jehrî xwe parastina herî baş bi demamikê (maske) ye. *Heta ku Kurdistan rizgar û azad nebe dijmin wê van çekêñ qirêj bikar bîne. Ji bo vê divê her Kurdeki ji xwe re demamikekê peyda bike.* Yênu ku nikarin demamîk modern peyda bikin, angô biki-rin, dikarin li gor imkanen xwe bi xwe demamikan çêkin. Çawa?

1- Mirov dikare naylonke qalind bikişîne serê xwe û ji bo nefesgirtinê tala dev qul bike û bi paçekî ji ard an pûş tijekirî bigre.

2- Mirov dikare berçavkekê (gozlik) bide ber çavê xwe, rû û serê xwe heta paş hustu bi kumekî mezbût bigre.

3- Di dewsâ kum de mirov dikare çefiyekê bikar bîne.

Ew tedbîrana ji tunebûnê çêtir in.

Oda parastinê:

Di warê xweparastinê de tedbîreke din a girîng, amadekirina odaka taybetî ji bo parastinê ye. Li Kurdistanê divê her malbateke Kurd, li gor imkanen xwe odaka parastinê amade bike. Ji bo ku ev ode hîç hewê negire, divê dîwar bi naylon bîn izolekirin, derî, pencere û ber maxan bîn girtin.

Di vê odê de divê betanî û teştek ava sar hebe. Wexta ku gazen jahrê hatin reşandin divê herkes di vê odê de, xwe li ser zik dirêj bike û betanîyan bavêje ser xwe. Divê zarok ji berê de bîn temîkirin ku li derive nemînin.

Pişti 5-10 deqîqan divê mirov ji bin

Stîriyên me...

Lawikê Berrîvanî

"PÊŞVEÇÛN" Û XWE "NUHKIRIN"

Herakleitos dibêje li "Cîhanê her tiş xwe nuh dike û tê guherandin". Ev qanûna tebîetê ne bes ji bo heywan, teyr û tû, dar û ber, her wisa ji bo hemû civat û mirovan ji derbas dibe. Li hember vî ilmî û vê felsefî tu îfîraze min tuneye û ez ji bawer dikim ku wek her tişî mirov ji tê "guherandin". Him ji çawa? Hin kes henin wek rîsê mirov di denê de ke, salê dikevin boyaxekê. Lê nav, "pêşveçûn" û xwe "nuhkîrin" e.

Îcar çaxa me got, "nuhkîrin" û "pêşveçûn" ev nayê wê manê ku her kes bi yek şîpê xwe nuh dike, ya ji pêş ve diçe. Di vî warî de ferqiyet hewqas mezin e ku qet jê nayê gotin; hin bi leza meşa kûsî "pêşve" diçin û xwe "nuh" dîkin û hin ji bi beza xezalê. Lê hinek Kurdîn me yên Ewropayê xwe hewqasî zû "guherandin" û "nuh kirin" ku ne tenê xezal, dîyalektîka Herakleitos ji li pê xwe hiştin. Heger rahmetî serê xwe ji gorê rakira, ez bawer dikim ku li hember sureta vê guherandinê wê gelekî şâş bîma. Wê şâş bîma û ji xwe re bigota, "di nav demek wisa kin de, gelo mirov çawa dikare hewqasî bê guherandin, bibe tiştekî din?"

Bê guman heger Herakleitos wisa bifirkirya ji neheq bû; neheq bû ji ber ku li vira mewzûya me Kurd in û ji Kurdan ji Kurdîn Ewropayê ne. Çawa ku di her warî de Kurd xwe zû "nuh" dîkin û zû "diguherîn", di nav van 7-8 salên surgûniyê de, di warê ehlaq û demokrasiyê de jî rekore nuh şikandin. Heger hûn bawer nakin a ji we re numûneyek:

"Hin-zirt pênc pere-ji paş û pêş davêjin"

"A her pîstirîn û ne xweştirîn ji ew e: hem li welêt, hem li derveyê welêt; dergevanen kerxanan, qewadênu kuçan, Beko Ewan, ên hîz, serxwêşen şevan, heşâşen terez, derûvanen her dem û berûyên bê şeref bûne siyasetvan!" (Derwêş M.Ferxo Kurdistan Press, jîmar 31, r.7)

Van gotinê jorîn li kuçan û li çayxanan nayên gotin, di rojnamak pêşverû, demokrat û siyasi de têbikiran. Bi navê demokrasiyê têbikiran.

Çaxa min van xeberên (çêrên) jorîn xwend, min ji çavê xwe bawer ne kir, lema ji ez bi "xebatkarekî" Kurdistan Press re peyivîm. Min got hevalo, ev ci hal e, hûn çawa van xeberan diweşînin? Û ez bawer dikim hûn ji rojnama we ji siyasi ne... Bersîva "xebatkarê" K. Press ji nefsa xeberan diweşînin? Bi kurtayî dersa demokrasiya wan bû. Berê got, "na, xeber nedaye", lê pişti ku min jê re xwend, got: "Bila bibêje, em ne wisa ne ku.." "Gotina din ji, "Siyaseta me ya weşanê ev e; demokrasî ye, tu ji dikarî bersîva wî bidî..."

Elî Axayê Bucaxî li qahwexanê rûniştibû, serxwêşekî berdûş hat li ber sekînî û got: "ê nigê wî li erdê ye, ez wa wayî dê û jîna wî bikim".

Elî Axa di cî de nigê xwe ji erdê rakir.

Berdûşê serxwêş îcar got: "ê nigê wî li hewa, ez wa wayî dê û jîna wî bikim" Elî Axa nigê xwe cardin danî.

Bersîva "xebatkarê" K. Press ji bû ev mesele, dibê "em ne dergevanen kerxana, ne qewadê kuça, ne hîz û ne ji bê şeref in" wê çaxê bila bibêje. Yanî kî wisa ye bila ew bixeyide... Axir, henek li wir lê pişti axaftinê min baş fahm kir ku hin Kurdistan me di warê ehlaqê siyasi û demokrasiyê de ku çiqasî bi "pêş" ketine...

betanîyê derkeve û berê çav û dest û rûyê xwe biço. Paşê divê mirov cilêñ xwe hemîyan derxîne têxe naylonê û laşê xwe bi ava sar û sabûnê paqîş biço û cilêñ nû li xwe bike.

Li ser merkeza cîhê gazê divê pûş li ser bê komkirin, neft li ser bê reşandin û bê şewtandin. Heta du rojan, bi taybetî ji zarok divê neçin ciyê ku gaz lê reşiyaye û wira bînh nekin.

derkevin derkeve û divê kes nêzîkî merkeza ciyê gazê nebe.

Li ser merkeza cîhê gazê divê pûş li ser bê komkirin, neft li ser bê reşandin û bê şewtandin. Heta du rojan, bi taybetî ji zarok divê neçin ciyê ku gaz lê reşiyaye û wira bînh nekin.

Babê Çawîş

Dexîl Şimo

Bizava nivîsevanêd ku li ser (ayin) dîn û torê (adetê) êzdiya dinivisin, van sala hêdî ajar dîbit û kitkite gotar û têkst têne tomarkirin û belavkirin, hindek lawêd dilsoz karin gelek layêd (alyen) bi nix û bîhadar bijîwa kom û berhevken û ev mîletê Xudêperês bi cihane dene (bidine) nasin û nehelan veder.

Xudê mezin jiye wan dirêj ket û heviya min ew e berde-wam bin bo lêkolîn û diyarkirina babetêd veşarî ji bo rizgarkirinê ji windan û neman, yan ji rastdiyarkirina wan babetêd ne bi durustî hatin nivisin.

Ez ji dê serê xo bidime nav vê seneyê û dergehekî ku nehatiye qutan (kutan, lêdan) dê qutim (bikutim, lêdim) da nemînit bê ber (par). Ew dergehê "Babê Çawîş" e.

Çawîş, Onbaşî: Peyveka Tirkî ye. Lateke leşkri ye. "Çawîş leşkerî", yuzbaşî, qaymeqam, emir alayîl

Xidirê Pîr Silêman dibêj-ît2, peyva çawes, çawûş, çawîş peyvaka Kurdi ye, pêk hatiye ji peyva "çaw" "le", "îş", mirovê çav li kari. Bi borîna wextî, bû "çawûş", mirovê ayînî(dîni) ku serdarîya tor ûterzêd ayînî diket.

Êzdî dibêjinê "Babê Çawîş". Ew rîsîpiye, serokê xizmetkar û berdestiyan e ku li Lalaşê3 kar dîkin. êk ji zana û têglihiştîyêd êzdiya ye, gelek qewl û qesid û beyt û mejûwa ola (dînê) xo vêt (divêt) bizanit. Ne dûr e eger hostayekî aza (mîr, ne tirsonek) û çeleng bit; weki behîsti Babê Çawîş Pîr Çerut kurê Pîr Ilyas4, hosta-ye Babê Şêx, Xudê jê razî; Şêx Heci kurê Şêx Simaili bû ku li roja ïnê 14 10 1977 li gundê Be'erdê çuye ber dilovaniya Xudê5.

Dîsa hostayê Feqîr Heci kurê Feqîr Şemo6 yi bû nuhe li gundê Be'eidê mirovîkî zana û melevan e di riya ola xwe da.

Babê Çawîş, êk (yek) e ji serokê ruhaniyêd êzdiya, endamek e ji endamêd civata ruhaniya, ol û ayin û torê êzdiya "Li roja ïnê 19'ê meha nîsanê sala 1968 biryar dan-biryara eykê bû-ku civateka rûhani bête danan ji bo danan û damzerandin û rîvebirîna yasa û biryar û kar û barêt êzdiya bi serokatiya Mîrê Şêxa Tehsin Begê û endamîya Babê Şêx û pêşîmami û mezinê Qewala û Babê Çawîş7 û ...h.w.d. Her yekê ji van nasnavêd (leqebe, rutbe) ayinî, karê xwo yê taybeti heye.

Dîbit Çawîş ji her sê çîna

yêd ku ayînê Êzdiya pê pêkhatî bit. Anko dîbit şêx bit, pîr bit, mirîd bit. Hêsta genc (ciwan, xort) dê hête (bête) Laleşê, bite derwêş û fêrî zanîn û qewl û beyt û qeside û tor û tebiêtêd ola Ezidiya

berê şibayikê¹⁵ diken û Tawus¹⁶ ciwan (paqîş, xweşik, sipehî) diken, piştî ji gerê dizivirin vêca li gel hemû mezinêt rûhanî qewl u qesida dibêjin û rewaneyî



Ziyareta Laleşê: Jî aliye roj helat ve hundîre hewşê. (foto: Athelstan Riley, 1886)

bit, li ber destê hosteyekî de dest bi dua û diroze û hedûsetê ket, xizmeta Şêx Adî⁸ ket û rîk û pêkkirina Laleşê. Rî û simbêla natiraşit, goska⁹ berdet, cilkê sîpi û ber xwe diket, şâşikeka ji hiriya miya risti li serê xwo dialînit (dilefîne, dipêce) û risteka ji men'ezî vehonayî û risti li pişa xwo girêdet.

Ne jinê dihînit û ne li tena û xoşa dînyayê digerit, hemû jiyana xwo terxan diket bo perestin û secûd û hedûsetê, rabûn û rûniştina wî û jiyana wî ya li Laleşê, êk e ji kesed mala sefila¹⁰. Mala Sefila, pêkhatiye ji Babê Çawîş û kabaniya¹¹.

Serderiyê Şehsuvari¹² ye. Deriyê aqda Şehsuvari bi deriyê Şêx Adî ve ye. Aqda Şehsuvari xezîna Şêx Adî ye Ala û Hilîl¹³ û çira û nişanêd wan xasêd ku gundê lê êzidî nebin têda ne, disa eger Hilîla xaseki nû kirin, ya kevn dê lê danêñ (deynin) Carcarâ Tawus, si-cada Babê Şêx, textî û nivîserê (nivîskarê) wê wutarê berî vê salê hatiye Laleş yan ku li serdemê (di dema) Babê Çawîş ê behîsti pîr Çerût bû.

Li ber deriyê Şehsuvari, Babê Çawîş rojê çar pênc cara diroza û mishabeta dibêtî, li rojêd cejna li ber aqdê rûdînit û êzidî li derçikê ziyaretî dîbin û fitwê lê didanê vêca dê duaya li wan ket, hêviya ji Xudê û Şêx Adî ket ku mîleti ji qeda û bela dûrket û biparêzit.

Karêd Çawîşî di zor in, ji der ku ser û beriya gel diket, dewrê wî ber çav e dema

Başik û Bazanî¹⁷ diken

Li dimahiya cejn û semaya, dema mîlet ji Laleşê di-zivrite gundet xwo, Çawîş seroktiya xizmetkara¹⁸ diket da gelî paqîj û xawênen, aqda, kolana, bin dara bîmalin û bison.

A gelî pakij û xawênen, aqda, koloan, bin dana bîmalin û bison.

Babê Çawîş semakêş e û ji wan yêd bi vî terze edetê ayînî radibin li şevêd cejn û cemaya û li gel qewla têye kirin.

Dema sematê dihêne ber qapiya Şêx Adî (Deriyê Mezin) Babê Çawîş wan sîpiya û civatê agedar diket û sê cara dibêjin "kerem ken". Li gel dengê wî def û şibab lêden û civan hemû dest bi semat xuranê diket.

Tîstê ez tê gihiştîm dema min wutara (gotara) "serda-nek bo Gorra Şêx Adî"¹⁹ xwondî, çawişî yê ("Çeqeltu")²⁰ digerit, her çende niho ser deriyê Şêx Adî bi vî karî radibit, lê ya ew wutare kevn e û li sala 1936'ê zayînî hatiye belavkirin û nivîserê (nivîskarê) wê wutarê berî vê salê hatiye Laleş yan ku li serdemê (di dema) Babê Çawîş ê behîsti pîr Çerût bû.

Ebdulrezzaq el Husnî di kitêba "El Yezidiyûn, Hadîrum we madîhum" da di-bejît "li cejna qurbanê Çawîş selikeka nanî tenik (tenikî) li ser serê xwo da dinêt û li gel xelkê bi ser Çiyayê Erefatê dikevit û li ser ber-rekî (kevirekî) bilind wî nanî dihilavêjît, her êk pir-tikeka nanî hildigirt û bi lez û bez ji çiyayî xwo berdeden gelî û di ava "Kaniya

Sipî²¹ dihilinin (dadikin) û têne civata Mîrê Şêxa û Babê Şêx. Her kesê berî hemîya gehîste civatê, Mîr dê wî xelat ket²²

Bi rastî ev renge seyrane ya heyî û li Cejna Qurbanê tête kirin. Gencêd el û gunda mil milanî di vê seyrane da diken lê weki gelek hilînvînê (şâşiyê) dî ku Eb-dulrezzaq El Husnî tûşbûyi (lê rast ha tî) û nikariye durust bizanit, çinko birastî yê bi vî kerî radibit "Mîr Hec"²³ e, ne Çawîş e.

Mîr Hec jî rihsîpiyekî binemala (ji mala) mîra ye, pismîr e, bi hindek karêd Mîrê Şêxa radibit, taybeti li rojê cejna.

Bi rastî, hejmara hemû Çawîşâ min nezanî, her cend min pîrsîyar ji pîremêra dikirin lê min ci serede jê nekirin, bi tenê du min nasîn, ew jî,

(1) Miçim el Meanî, Necîb Îskender.

(2) Xidir Silêman, mamostoyê zimanê Kurdi ye li amadeya Esvinê, danerê kiêba "Êzdiyatî li Ber Roşnaya Hindek Têkstêd Ayînê Ezdiyan" û kitêba "Gundiyyatî Alîkî Antropoloji" gelek vekolin û wîtar li kovar û rojnama de belavkirin.

(3) Geliyê Laleş, gelyekî pîroz e. nîzîki qeza "Sincan" e. Kûstîn û dîzî û nêçîr lê qedexe ye. Gelîki pêkhatî ye ji şûnewarêd û bab çakêd Êzdiya û ava Kanya Sipî û dar û barêd boş gurr, pîrr, qelebalix) û bilind. Bi dirêjî li ser hatiye belavkirin di: a) Govara Rewşenbîrî Nwê, jimare 109, 1986-lapere 109 "Kurtiyej ji Dîroka Laleşê", nivîsına Seid Silo. b) Govara Karwan, jimare 35, 1985-lapere 78 "Laleş" nivîsına Gihu Silêmancı) Govara Karwan, jimare 52, 1987. Lapere-132, "Laleş" nivîsına İzzedîn Selîm Baqîsrî.

(4) Xelkê Êsîvrê bû, Çawîş bû, gelek di riya ola xwe da bû. Li gel du kabaniya hate kûstîn li Laleş bi destê hindek çekdarê êla Dêrkiya.

(5) Êzdayetî li ber roşnaya hindek tekstîd ayînê Ezdiyan Xidirê Silêman û Celîle Cindî, lapere 193.

(6) Her ew jêder, lapere 195.

(7) Gundiyatî, Alîkî Antropoloji, Xidirê Silêman. lapere 87.

(8) Eger te bîvît bi direjî basî Şêx Adî bizanî, bixûne di kitêba Ezdiyatî li Ber Roşnaya Hindek Têkstêd Ayînê Ezdiyan, lapere 100.

(9) Qosk: kezî.

(10) Sefil: mirovê jiyana xwo bi sicûde û parastinê dîborînit.

(11) Kabanî: Jina xwo sikandî bo parastinê.

(12) Şehsuwar: Bab çakekî Xudênas e ji xasêd Ezdiya dibêjîne "Faris el Fîrsan". Aqda wî ya li Geliyê Laleş, disa qubekî lî gundê Bêbanê ya heyî, şûnewarê wî ye serdarê wê qubê mala Şêx Mirzayê Bêbanî ne. Mam Xemo, pîremêrekî Hewêriye li gundê Bîzedîrê jiye wî pitir e ji 70 sala digot: Li pêsa borî, aqdek hebû me digotê "Şehsuwar", em lê ziyyaretî dibûn, Fila digotê "Mar Gorgîs", roja şanêdênê, her êk file serbirek dikust û li gel mala xwe, li ber wê Aqdê heta êvarî seyrana xwo dikirin weki cejn û tewfa.

(13) Hilîl û Ala : nişanêli ser her qubekê yêd heyîn. Hilîl ji tûncî durustkirî ye û ala ji kincikê nengawreq.

(14) Aqd: Avayeka weki xanî ye, her xasekî bo xo êk ava kiribû li gelyê Laleş, bi tarza avahêd berê ne, niho gelek jê hatine lêkirin

(15) Nişanê Ezdî û Tawusî melek in.

(16) Nişanê Ezdî û Tawusî melek in.

(17) Başik û Behzan: Du gundêd Êzdiya ne nîzîkî bajarê Mûsil.

(18) Xizmetkar hindek ji êla Xetariya ne li Basik û Behzanê.

(19) Nûserî Kurd, jimare teybetî, 2.1986 bi bûna festîvala (merbeta) hevitê serdanek bo gorra Şêx Adî-Nîsînê P.W. Long wergérâna Hisén Ehmed el Caf. Ew wûtarê hatibû belavkirin, sala 1936î zayînî di govara "El Cemîye el Melikiye el Asyawiye el Merkeziye" bi zimanê Ingilizî.

(20) Ceveltu: Çirayekî mezin e, tîjî rûnê zeytûna diken û fitîla di nav wî rûnî diken û agîrî berdîdinê. Ew fitîlene ji pembûyî di rêsayıne, herû êvara çeveltuyê digerrin û hemû Aqd û cihêd pîroz li hemû Gelî pê rûn diken.

(21) Kaniyeke pîroz e li Gelyê Laleş, Tawusê û Berê Şibayîkê, pê pak diken, piçûkê ji nû Xudê ditit bi ava wê kaniye mor diken.

(22) El Yezidiyûn, Hadîrum we Madîhum El tebîel samine, Ebdulrezzaq el Husnî, lapere 109.

(23) Nicmanî kurê dawut begê Mîr Hec bû, lê ya çû ber dilovaniya Xudê mezin li adara 1987, lew divêt êki şûna wî danêñ.

(24) Evene hemû Babçakêd Êzdiya ne, Sûnêwer û Aqdêd wan yê li Laleşê.

Pîr Çerûtê Kure Pîr Ilyas bû û Pîr Kemalê kurê Pîr Mer'an e nuha li Laleşê ye, xelkê Ciyyatê Şingarê ye jiye (tenanê im- rî) wî nîzîki 60 sali ye.

Hêste zarok (buye) nexoşîyekî girtibû, îname (anîne) Laleşê û xwo havêtine Şêx Adî û bîryar dane, eger sax bit û ji wê nexoşîyê vereset çend sala xizmetê li Laleş biket. Li sala 1947 hate Laleşê, çend sala xizmet kir, gelek bi wî xweş bû bîmînit, lew li sala 1952 kirne Çawîş, mirovekî devlikên e pir bi rûmet û zana ye, ya min gotî hemû min ji jiyan û dan û stendina wî zanî. Çinko min çak têke-liya wî ya kiri.

Ji der wan karêd me bi rêz kirin, pêtivê ye bête gotin vi ciwamerî bizav û zeverya kirî gelek karêd serbilindi yed dî kirin, hêj ji mîj e darêt tuwa û zeytûnû hinara li gelî di çandin û di ber ra dihat û dicû av didan gelek aqd û munasib û mezarge-hêd kevn ji hesêba xwo xêra mîleti ava kirin û nû kirin, weki aqda: Pîr Ali, Pîrê Mûs, Pîrê Qelender, Şêx Cinît, Baxoyê Eyzî, Dirbasê Kurdi, Berê Xefûra, Mezinê Zebêniya (Sexrê Cin)²⁴

Kerwan, jimar 57

"Trajediya Kurdistanê bi xwe babetekî sînemayê yê dewlemend e"

Mehdî Umêd ji Kurdistanâ Başûr, ji bajarê Kerkükê ye. M. Umêd li Moskovayê di Akademiya Bilind a Sînemayê Beşê Senaryoyê de doktora xwe dike. Heval Xalidê Berxo di derheqê sînemayê û tiyatroyê de pê re hevpeyvînek çekir. Em vê hevpeyvînê pêşkêşî xwendevanê xwe dikan.

Pirs: Birayê Mehdî Umêd tu li Moskovayê di Akademiya Bilind a Sînemayê di beşê senaryoyê de dixwînî. Lê bi qasî ku em dizanîn berî ku tu dest bi vê beşê bikî te wek hunermendekî tiyatroyê xebat dikir. Gelo tu dikarî behsa xebata xwe û rewşa tiyatroya Kurdi ya wê demê bikî?

Bersiv: Pişti Adara 1970'yi li Kurdistanâ Başûr rewşek pirr musâid ji bo bizavêk ji nişkave çêbû. Bi salan bû ku gel li hêviya jîneke sakîn û aştî bû. Vê sakîniyê ji gelê Kurdistanê re rewş xweş kir ku ew hemû alyén kulturî himêz bike. Şano (tiyatro) û temsilî alyekî herî gîringî vê rewşê bû. Dikarim bibêjim ku li Kurdistanê şano, qet tu wextê wek vê demê jê re ehemiyet nehatibû dayin. Di pirranya bajarê Kurdistanê de gurûbênen tiyatroyê çêbûn ku berhemên şo-reşgerî û cîvakî pêşkêş dikirin. Ji bîlî vê jî xortên Kurd berê xwe dan xwendina hunerî. Ev tîbûna rengvedana rewşa siyasi ya Kurdistanê bû. Eviya ji bo pêşdebirin û bilindkirina mustewa rewşen-bîrî ya xelkê tiştekî gelek baş bû. Di wan

Sînema karekî yekcar mezin e û cîhanêke berfireh e. Ji ber vê jî çend hunermendêne bê îmkaniyet nikarin bi tena xwe bi vî karî re rabin. Sînema ji bîlî ku hunerek e, dezgeh, pere û kadirekî taybetî jê re pêwîst e. Li pirranya welatên cîhanê, ku îmakanen wan jî hene, lê dîsan jî nikarin sînemayek berbiçav derxin ortê. Nuxta duduyan; du faktorêن giran hene ku sînemayê peyda dikan: yek, muesseyeke dewletê, duyem, şirketên xusûsî. Nuha me yek jî tuneye; ne dewlet û ne jî dewlemendekî Kurd, ku ji rojan rojekê bîra projek wiha bibe. Her çiqas nuha raberizandina (munaqesa) cîhana sînemayê bala hin hunermendêne Kurd kişandibe û çend kadirên sînemayê peyda bûbin û hin xortên Kurd ji bo sînemayê li dervayî welêt hebin jî, lê belê hîn jî di em di qonaxa destpêkê de ne û ji bo peydakirina muessesa sînema Kurdi hîn tu muhaweleyeke ciddî nehatiye kirin.


Pirs: Madem ne dewlet û ne jî şirketên me hene, wê çaxê tu ji bo ci beşê sînemayê dixwînî, ne tiyatroyê?

Bersiv: Wek min di destpêka sohbeta xwe de jî bahs kir, şano dikare raste-rast pêwendiya xwe bi xelkê re deyne. Temâşevan ji çend sed kesî pêk bê dikarin di çend şevan de li bajar, ya jî li welatê xwe ji bo dîtina şanoyê bêne ba hev û lê temâşe bikin. Lî nuha ev rewş jî nema, hunermendêne ku bi şanoyê mijûl dibûn ji ber rewşa Kurdistanê û zordariya dagirkeran neçar bûn ku yek li pê yek jî welatê xwe derkevin û ji gelê xwe dûr bikevin. Trajediya Kurdistanê bi xwe babetekî (mewzûyekî) sînemayê yê dewlemend e. Ji ber vê yekê jî divê iro em bir bibin ku sînema ji bo nasandina gel û welatê me bi gelê cîhanê re çekeke pirr bi hêz e. Bi riya sînemayê em dikarin ji xwe re dost û hevalan peyda bikin. Wek netewakî xwedî huner, bi riya sînemayê em dikarin dengê xwe bigîhîn cîhanê. Filmekî sînemayê yê bi hêz û nuh di nav mîleten cîhanê de dikare bibe nûner û konsulosê Kurdis-

salan de min jî xwe di nav van xebatan de dît. Berhema yekemîn ku min wek aktor û nivîskar tê de rol girt, şano ya Kutayî Derebeg (Dawiya Axatiyê) bû. Rejîsorê vê şanogerîyê (piyesê) hunermend Selman Faîk bû. Ev piyes demek dirêj li Silêmaniye û li Kerkükê hat pêşkêşkirin.

Hunermendêne şanoyê wek pêşmergayan xwe bi xelkê dan qebûlkirin. Li gel hemû bê îmkanî, sansur û geleb problemen din, dîsan jî karîbûn berê xelkê me bi alyê şanoyê de bikşîn. Ji bo pêşdebirina vî hunerî her di vê demê de hinek hunermendêne zîrek roleke gelek mezin lîstin. Wek: Ahmed

meselê heye. Em bi eşkere û bi cesaret dibêjin, diviya lawê Kurd mil bi milê şoreşa Kurdistanê xebatê bike. Îcar ev heta ci mistewayê bi ser ketiye, yan encama vêya çawa dibe ev dikeve ser milê me. Li Moskovayê, di Festîwala Mosko-



tanê. Divê em bi şêweyek zanistî û zîrekî sînemayê peyda bikin. Filmekî Kurdi yê dramî her ne girî û derdeserî û azar û tahliya jî yanê ye. Na xêr, divê bi hawakî zîrekî û hunermendî em azar û hêviyên xwe bi gelên cîhanê bidin na-sandin.

Pirs: Sînema jî sinet e; lê belê Kurdistan ji ali aborî de paşde maye. Gelo mumkûn e, ya jî rast e ku sînema berî bingehêk aborî ya bi hêz peyda bibe?

Bersiv: Li ser vê meselê Brecht dibêje; proletarya Rûs hîn sinetkariyek dirist nekiribû sînema dirist kir. Bê gu-man em bi tirs berê xwe didin vê meselê û ihtîmal e ku hinek jî ji me re bibêjin: "Kînga Kurdistan bû dewlet wê çaxê emê sînemayê jî ava bikin, wê çaxê emê hesabê vê yekê bikin. Yemena Demokratîk û gelek dewletê din dewletin, lê hîn sînema wan tuneye; ne bes tuneye, bîra vê meselê jî nebirine. Lî ê me Kurdan daxwazî û tîbûnek me ji bo vê

Trajediya Kurdistanê bi xwe babetekî sînemayê yê dewlemend e. Ji ber vê yekê jî divê iro em bir bibin ku sînema ji bo nasandina gel û welatê me bi gelê cîhanê re çekeke pirr bi hêz e.

meselê heye. Em bi eşkere û bi cesaret dibêjin, diviya lawê Kurd mil bi milê şoreşa Kurdistanê xebatê bike. Îcar ev heta ci mistewayê bi ser ketiye, yan encama vêya çawa dibe ev dikeve ser milê me. Li Moskovayê, di Festîwala Mosko-

vayê de bi rejisoreka Alman re li ser sînema Kurdi em diaxifîn. Monica Maurer çend xal destnîşan kirin; heger bê û filmekî Kurdi jî çêbibe bazara wî nabe, nikare bigihîje xelkê. Çimkî qet tu alî tuneye ku vî karî bigre ser mîlê xwe. Bi gotinek din, alyî tîcarî pirr girîng e û pêwîste baş hesabê vê yekê bibe.

Ji bo nîşandan, naskirin û dîtina bazaar filêm sînemayê hin festivalen cîhanî çedîbin, wek :KAN, MOSKVA, TAŞ-KENT û h.w.d. Ev festîwal hinekên wan hunerî ne û hinekên wan jî tîcarî ne; ên dikirin û ên difroşin tên ba hev. Û bi vê riye film riya xwe ya berbî bazarê dibîne. Ji ber viya jî, ew kesen ku bîra filmekî Kurdi dikan divê hesabê bazarê jî bikin.

Pirs: Li vir dixwazim tiştekî bi-pirsim, ma gelo sînema me heye, yan jî bi gotinek din em dikarin qala sînema Kurdi bikin?

Bersiv: Heta nuha me sînema Kurdi tuneye, lê di nav sînemayê de behsa Kurdan hatiye kirin. Ci bi filmen dokumenter û ci jî bi filmen hunerî be. Lî dîsa jî ev nayê wê maneyê ku sînema Kurdi heye.

Pirs: Filmên Yilmaz Guney ?

Bersiv: Belê Yilmaz Guney Kurd e û bi serbilindî xwe bi cîhanê da nas kirin, lê mixabin filmen wî bi Tirkî hatine nasîn. Îcar em bi xwe ji hev re bibêjin filmen wî Kurdi ne ew tiştekî din e. Lî bi resmî û di sicil û ferhenga sînemayê de wek sînematorekî "Tirk" tê naskirin. Û ev jî ne gunehê Y. Guney e û ne jî gunehê gelê Kurd e. Her çawa be jî Y. Guney pehlewan û hunermendekî sînema cîhanê ye; rexnegir û dîroknişen sînemayê wî wekî Kurdekkî nas dikan. Lî kes nabejê filmen wî filmen Kurdi ne, bila ev wezîfe jî bibe wezîfa neslîn bê.

Pirs: Wek tu jî dizanî, gelek hunermendêne Kurd hene ku

VPEYVÎN HEVPEY

berhemên wan bi zimanekî din e. Li gor dîtina te em dikarin van berheman yên Kurdi bîhes-ibinin, yan na ?

Bersiv: Ez dibêjim na. Ji bo numûnê: Bulend Heyderî û İbrahim Tatlıses Kurd in. Lî tenê em dibêjin Kurd in, ew jî qîmeta wê çiye ? (Xwedê işe wan rast bîne) Rast e huner ji bo hemû mirovatiyê ye, lê dibê mohra xwedî lê be. Berî her tişti divê hunermend ser bi gelê xwe be û di nava gelê xwe de ji dayik bibe û rehênen wî di axa wî de be. Xalek yekcar

**Heta nuha me sînema
Kurdî tuneye, lê di nav
sînemayê de behsa
Kurdan hatiye kirin; ci
bi filmên dokumenter û
ci jî bi filmên hunerî
be. Lê dîsa jî ev nayê
wê maneyê ku sînema
Kurdî heye.**

girîng heye; ew jî ev e: Hunermendê Kurd divê tu carî ji bîr neke, ku di çarçewa Kurdistanê de serê xwe hilde û bila paşê gulî, şitil, çıqıl û pelên me biçin nav gelên din. Em hewl bidin hunerekî bilind, bifikirin ku viya çawa pêşkêş bikin û bila ev huner her tim bi navê Kurd û Kurdistanê be. Yanî divê bi her hawayê xwe, xwe Kurd nîşan bide. Û ya din jî

hunermendê Kurd divê qet ji bîr neke ku ew hunermendekî têkoşer e. Ev kar ji heya nuha Y. Guney pê re rabûye.

Hunermendê me yên pirr zîrek li dervayî welat hene û ew dikarin bi navê Kurdistanê biaxifin. Ji bo numûnê: Koma Govend berhemeke diramî, ciwan (xweş) û serkeftî li Stockholmê pêşkêş kir. Ev Kom divê bête himêz kirin, xizmet jê re bête kirin. Û her govendgêrekî (İstikvanekî) vê Komê jî divê xwe wek pêşmergeyekî hesab bike. Divê hewl bête dayîn ku li ser navê Kurdistanê beşdarî festivalen cihanî bibe. Ji nuha ve divê kar bête kirin ku ev Kom bikaribe beşdarî festivalen lawên cihanî bibe û wê çaxê bi riya rojname û telewîzyonê emê bikaribin xwe bidin naskirin û mil bi milê şoreşa Kurdistanê propagandê bikin; ji bo pêşerojeka azad û serbest, ji bo welatê me.

Pirs: Raya te li hember huner û siyasetê çiye ?

Bersiv: Bi baweriya min di vê qonaxê de divê hunermend jî mil bi milê siyasiyan bi dilsozi têkoşînê bide. Lî eger hunermend ne hizbî be baştir e. Hunermend bila dilsozi û karîna xwe di himbêza serbestiya xwe de bi kar bîne. İro li Kurdistanê bi dehan pertî û rêxistin xebatê dîkin, hunermend bila pêşmergê gelê xwe be. Bê guman her kes serbest e ku bibe endamê partiyekê, yan ne be. Lî ez bi xwe wisa tê digihîjim ku hunermendê Kurd divê iro Kurdayetiye bike, ne hizbayetiye. Lewra divê ji bo damezrandina merkeza (malbend) sînema Kurdi hewl bête dayîn û ev malbend

divê bi ser şoreşa Kurdistanê ve be, ne ser bi vê hizbê, yan jî hizba din. Divê hunermend xebatê bike ku partîyan nêzikî hev bike. Divê ji hunermendan re

**Hunermendê Kurd
divê tu carî ji bîr neke,
ku di çarçewa Kurdistanê de serê xwe hilde û
bila paşê gulî, şitil,
çıqıl û pelên me biçin
nav gelên din.**

Hewildana Y. Guney gaziye û agahdariyek pirr hêja bû, ku bi riya filmên Y. Guney xelkê Kurd nas kirin. Karê wî kir şoreşeka hunerî bû. Mixabin ku hunermendê Kurd nikarin qezencekê ji karê Y. Guney bigirin û piştî wî meydan vala ma. Lewra ez pêwîst dibînim (ev jî ne daxwaza min tenê ye, daxwaza pirraniya hunermendê Kurd in) ku şeweyê dezgeheke dramî bête damezrandin. Ev dezgeha, navê wê ci dibe bila bibe. Divê ev dezgeha bikaribe hunermendan şano û sînemayê ji hemû perçeyen Kurdistanê di bin ala xwe de kom bike û konferansekê çêbike, qadirê sînem û şonayê xuya bike û xwendinê ji lawên hunermend re amade bike.

*Pirs: Kak Mehdi, nuha tu li ser
ci mijûl dîbî ?*

Bersiv: Heta nuha min senaryoya çend filmên Kurt nîşîye: 1-) Jiwan Le Jér Pelkezêrîne da (Di Bin Keskesor de). 2-) Geran Be Daway Xaka (Gerra Li Axa Xwe). 3-) Geştek Be Cihanî Cinewer (Pira Delal). 4-) Çend filmên kurt, ji wan yek Pirdî Delal

Pirs: Ji bili sînemayê ?

Bersiv: Heta nuha min sê şanogerî (piyes) çap kirine û çend berhemên din li ser şanoyê pêşkêş kirine. Û nuha jî ez dixwazim romanekê çap bikim. Navê romanê Kes Nekêl e.

Ez hêviya serkeftin û rastgoyî û pêşketinê ji rojnama we ya Armanc re dixwazim. Sipas.

30 Parlamente:

"Zimanê me yê zikmakî Kurdi ye"

■ İbrahîm Aksoy (Meletiye) Ma ji bo ku ez Tirkî hîn bibim, min hindik lêdan xwar?

■ Mustafa Demîr (Riha); "Em her du zimanan jî bi hev re fêr bûn. Pişti ku zarokên min mezin bibin, ezê wan bişînim Rihayê; bila zimanê diya xwe hîn bibin".

■ Mehmet Kahraman (Diyarbekir); "Diya min bi Tirkî nizane; bavê min li eskeriyê fêr bûye û ez jî li mektebê fêr bûm".

Hin parlamente, her ci Kurd bûn jî, bersiva pîrsa nedan û hinekan jî bi durûti gotin ku "zimanê me Tirkî ye"

Kovara hefteyî ya Tirk; 2000'e Dogru (Ber bi 2000'i ve), ankêtek di nav endamên Meclîsa Milî ya Bilind a Tirkîye de vekir ku ji wan dipirsî ka gelo zimanê wan ê zikmakî çiye. 97 Parlamentean bersiva anketê dan ku 30 kes ji wan di bersiva xwe de dan xwiyakîn ku zimanê wan ê zikmakî, "Kurdi" ye. 3 kesan ji van ne xwestin ku navê wan di kovarê de bê diyarkirin, lê yên din ne li dijî vê bûn.

Dî nav van 97 kesan de, hinêñ din jî her ci bi eslî xwe Kurd bûn jî, yan bersiva pîrsê nedan yan jî gotin ku zimanê wan ê zikmakî xwedêgravî "Tirkî" ye.

Yek ji wan kesen ku bersiv neda, Hikmet Çetînê Licî yê ku mezinê wî qet hersek Tirkî jî nîzanibûn, yê din jî Kamuran Înanê Bedlisî yê ku kalikên wî di serîhildana Mele Selîm a 1912'a de hatin bi dardekirin. Evana iro dev ji eslî xwe berdane, yek li baskê cepê, yê din jî

li baskê rastê di xizmeta dewleta Tirk de ne. Fehmî Işıklarê Rihaye jî ku Sekreterê giştî yê sendika DîSK'ê bû, bersiva pîrsê neda. Hinek parlamente jî rastiyê anîn ziman;

Mustafa Demîr (Riha); "Em her du ziman jî bi hev re fêr bûn. Pişti ku zarokên min mezin bibin, ezê wan bişînim Rihayê; bila zimanê diya xwe hîn bibin".


Mehmet Kahraman (Diyarbekir); "Diya min bi Tirkî nizane; bavê min li eskeriyê fêr bûye û ez jî li mektebê fêr bûm".

İbrahîm Aksoy (Meletiye); "Ji bo ku ez Tirkî hîn bibim ma min hindik lêdan xwar?"

Parlementerên ku di bersiva xwe de dan xwiyakîn ku zimanê wan ê zikmakî "Kurdi" ye, ev in: Naîm Geylanî (ANAP -Hakkâri), Cumhur Keskin (SHP-Hakkâri), M. Abdulkadir Ceylan (DYP-Siirt), Mahmut Alinak (SHP-Kars), Fuat Atalay (SHP-Diyarbekir),



M. Eli Eren (SHP)



Mustafa Demîr (ANAP)

Kamer Genç (SHP-Tuncelî-Dersim), Adnan Ekmen (SHP-Mêrdin), Süleyman Çelebi (DYP-Mêrdin), Alattin Fırat (ANAP-Mûş), Mehtî İşık (ANAP, Mûş), Orhan Veli Yıldırım (SHP-Dêrsim), Nurettin Dilek (ANAP-Diyarbekir), Salih Sonmez (SHP, Diyarbekir), Eşref Erdem (SHP-Ankara), Mehmet Ali Eren (SHP-İstanbul), hûsnû Okçuoğlu (SHP-İstanbul), İbrahim Aksoy (SHP-Meletiye), Mehmet Kahraman (SHP-Diyarbekir), Ekin Dikmen (SHP-İçel), İlhamî Binici (SHP, Bingöl), Mehmet Emin Seyfagil (ANAP-Mûş), Muhyettin Mutlu (ANAP-Bîtlis), Nizamettin Ozdogan (ANAP-Elazîz), Raşit Çelik (ANAP-Wan), Kutbettin Hamîdi (ANAP-Siirt), Mustafa Demîr (ANAP-Urfâ), Ahmet Tirk (SHP-Mêrdin), Beşir Çelebioglu (ANAP, Mêrdin), Ferit Bora (DYP, Diyarbekir), Ali Rıza Septioglu (DYP-Elazîz).

Kovara 2000'e Dogru vê anketa xwe ya di nav parlementera de dom dike.

Çîrok

Bakurofe

Perwîz Cîhanî

Danê zivistanêye sar digel sîr û seqema diltezin dest pê bûye. Givi na bayê û vizinâ bagerê ye. Berfa cil û kever e zivistanê der û dest û cil û çiya nixabtiye. Dibêji qey dînyayê kefenekî sipî li xu kiriye. Hindi çav qeter dike berf e û (jî) bili berfê ci tilst xuya nake.

Telte ewrêd kever di panatiya esmanê poxside da binanî rîwi û rîbiwarê ku di bageran da riya xwe şas kiribin û lev (li hev) bizivirin û nizanibin kani yê kuda herin, sergerdan û beride ne. Behra pêl pêli û bê ser û bin e berfê, giştî aqarê dînyayê daye ber xu. Erd û esman cil û kever (gever) e.

Nêçîrvanekî pîr li pêsiye çiyayekî bindî ku serê wî (di) nav qulte ewra da winda bûye û qûça wî çûye ber perrê es mana, rîça kérüşkekî hildaye û pêsiye behra kever e berfê diqelişine û pêşda dice. Ewî çend roja berî nihe kérüşkek birindar kiribû, lê nesiyabû bigre. Nêçîr (jî) girra wî derketibû. Eve midehek e. Nêçîrvan (jî) ber pîrtî û bêhêziye nikare nêçirek baş bike. Herçend ku êdi wes lê dikeve, emma neşê dest jî ravê (nêçîre) bîkese. Bir û hîzred aloz(serûbinî hev) ew avetine nav hev, kûr diponije û (di) dû şopê ra dile. Rîça kérüşkê ber bi geliek kûr diçû û kalo jî li dû, xwe radikêsa. Xûna sore kérüşkê ci ciya rijiyabû ser berfa kever û befr xal xali sore gevez kiribû. Evê xûnê, tima nêçîrvan bo destvejnana nêçîre zêde û zêdetir dikir.

(Li) hinde ciya bagerê kor (kort) û kend (kendal) ewsa tiji kiribû ku Nêçîrvan heta navikê (di) berfê da çek dibû. Hê nêzîki bi gelî nekiribû ku bagerek guj dest pê bû. Bû firtone û bakurofe û rîça kérüşkê li ser berfê bîzir (winda) bû. Édi ci rîç û şop ne dihat xûyan.

Piremîr tufenga xûye ravê avetiþû mi le xuû bê hamde xu (di) nav berfê û bagerê da gav radipîva. Berfê ser guhê wî nixabtibû. Lê oiremrê binanî polaû asinê avdayî, ci minnet ji bager û kurofê nedigirt û serê xu kiribû ber xu û berf diqelaşt û pêş da diçû. Ewî ev cil (çol) û çiya bihurst nasdikir, lê ba û ba- gerê mecalâ ditin û nasinê lê biribû. Hêdi hêdi seha westan û mandibûnê dikir.

(Li) devdorê xu niheri. Çavê wî bi ta-teki(tahteki) ket ku kimê wî di nav berfê da dihat xûyan. Ber bi tat zivirî û çû kundîk (li) ser tat rûnişt.

Berfa ser çavê xu paqîş kir û kinc û sol û zengale xu dakuta bi kujê kefîya xu berf û bûza ku bi simbelê wî va girtibûn temiz kir. Cigareyek ji berika xu deranî û vêxist, dukela (dûmanâ) cigarê binanî borîy sobê di dev û difnî wî ra hawit. Disa bir û hîzrek aloze çend demê pêşin ew di nav hev da girtin. Destê xwe da bin çena xu û kûr poniji. Eva çend roj e ku ci nêçîr bi dest nextistiye. Édi nikare bi destê vala û ustûyê xwar bîzivre mal. Her çewa be dibê ku iro nêçirekî bike û bi destekî tijî here ba jin zarêd xu.

Ji ser tat hilqedimi û rabû şipê. Çavêd xu yê pîr û qercimî kuta binê gelîyê kûr. Hemanê di binê gelî da reşek bi ber çavan ket. Bi hîviya nêçireki ber bi wî reşî ser gelî da qulubî û jor da şûlikî û singê kevere berfê qelaşt û pêş da şiqiti.

Hêdi hêdi nêzîkatî bi wî reşî dikir. Çavê xu kuskusand û dîna xu dayê malek bê xayî (xwedi) û xudan dûri gund, li nav deryaya bê ser û bin e berfa cil û kever da nuqim bûye. Xanî (jî) dûr va li nav berfê binanî xalek reş li ser perrek mezin e kaxzeza hatibe nitandin diyar dikir. Yan jî te digot qey kelekek biçûk e bê xweyî ye ku di nav behra berfê da cûm bûye û kimê wê bi zorê tê xwîyanê.

Tîstekî sirri û Xudayî, Nêçîrvan bê hemdî wî ber bi xanî dikîsand.

Êdi piremîr nêzîki bi xaniyê bêxayî kiribû. Gujina bayê bû. Bagarê berfa gîrik û topikêd dev gelî li dorhadorê xanî berev dikir. Berfê bejna kinedîwarê moreyewê hetanî nîviyê zêdetir dabû ber xu.

Çardîwarê wê malê ketibû gîrr û helboqa sar û gîran. Hewa ewsa sar bû ku şewata seqemî li mejî û hestîyê mirova kar dikir. Lerz û ricif ketibû leşê Nêçîrvan û diranê wî (jî) ber serma lev diketin. Kulek û pencera biçûk e xanî bi pirtikêd derizî ye şûşê nîv eşkestî û laylona hatibûn nixabtin.

Hêdi hêdi tarî dikete ortê. Şeva zivistanê ye (ya) bi kar û barbi ser bîna Nêçîrvanê pîr da xar bû....

Şev (bi) ser da hat. Şevek sar û reş û tar û tîrsîner û mit û mat. Xanî di nav reşatiya şevê û sîpihatiya berfê da kerr û bedeng binanî termekî bê giyan, bê hej û liv xu mat kiribû. Ci deng û seda û hejîyan û lîvat ber guha nediket û nedî-hate xuyan. Her tenê vizina bayê û guvîna bagerê bû ku binanî qemciyê zalim û zordara li leşê rût û sar û sivax-nekirî ye (yê) diwarê moreye xanî digirt û axîn û nalîn dikire dilê sikûsar e (ê)xanî û bêdengîya şevê dişikand.

Jî dûrve dengekî binanî zûrina san (sehan, segan, seyan) yan ûrîna gûra pîremîr ji nav deryaya bîr û hîzred şûm û aloz û tîrsîner û bedyon ku hiş û hedamî wî (di) nav hev da girtibûn, deranî. Pîremîr hate ser hemdî xwe, xwe berev kir û guhê xwe dagirt. Deng, dengekî nasyar bû. Dengê gûrê birsi(birçi) ku (li) nêçireki digeriya. Hema den gê ku çend sala berî niha bi denge gullê tu-fingga Nêçîrvanê pîr ditemirin. Pîremîr bê hemdî xu ber bî deriyê xanî şiqiti. (Bil) lûla tufenga xu du sê cara hêdika li derî da. Lê ci deng û seda ji hundurê xanî ber guhê wî neket. Derî bi destê xu pal da û kete hundur.. Çîrfinek sar ji qurrana derî hat, dengekî binanî eşkestina tiştekî nazik û hiş.

Te digot qey Nêçîrvan ji derva pal dane hundur. Hundurê xanî bêhna sirr seqemî dida. Ba dikete qelsed derê darîne rîzibûyi û şûşê derizî û eşkestî ye pencerê û naylona ser kulekê û ewane tev hildikutan. Arûk û banê alaşkiri ye xanî li ber hêrişa bakurîfa zordar dilerizîn û qîrcê qîrc dikete ban û pendî (sîvirnek) û alaşta. Toz û axek nerm ji ber bêna dirîjiya hundur xanî. Hûrîkê berfê binanî hûrê zîv, zîval zîvali di celx û qelsed derî û pencerê ra nermik nermik belayi nav malê dibû.

Xûsê xu avetibû der û diwar û pencerê, heta nîviya dîwara di xûsê da unda bûbûn. Pişta tikêd nîv eşkestî ye şûşêd pencerê xûs binanî tîfalek zîv xuri di-bîrsiqi. Reşatiya şevê û sirr û seqemâ zivistanê û guvîna bagarê dest dabûne hev û binanî kalkapûs pîr hepoka merivxur lekmê xu li dor wê male alan-dibûn û ew di nav hev da girtibûn û xis-tibûn gîrr û helboqê û dil girtibûn. Te digot qey xanî ji tîrsa va dinâlî û dilekîzi.

Li ser texçikeki fene rek hemanî diçirûsi û ronahiya wê ye zer û lerzok dabû nav malê. Te digot qey dil heye di (li) şevê sar û sirr û bi seqem da bi wê ronahiya zer û lerzok û germaya bê tîne xu li pêşîya hêrişa leşkerê hevgirti ye berf û bager û sirr û seqemâ zivistanê û re şatiya şevê bigire û ne hêle ew leşkerê şûm û hevgirti hucumê bidine hundur. Lê ewê jî tab nedianî û carina dibû pîrte pîrta wê û xu ranedigirt û hindekî dîma bitemire.

Diwarê rût û sîvaxnekirî ye hundur li ber zeratiya ronahiya fenerê binanî teveşa qercimî ye pîrek nîv ruhi dihate ber çava. Li qunceki xanî, pêşberî fene-re li ser doşeket nîv(zîzm) sobeyek sergina li xazîk û hesreta pulotê (pol, bizot) ges û alevêd germê agirê kermê mihiyan da devê xu (jî) hev vekiribû. Leşê reşê wê binanî destê qelişî û qalçik- dayî ye guniçi na, qelsî qelsî û kun kunî bûbû. Te digot qey devê xu ve-kirîye û çavê xu kutaye dêrî û çavnhîr e ku kesek bermilek ézing û hemezek qîrşik yan túrek devedestî bavêjê û dilê wê ye sar û tevîzî germ bike. Lê kanê ew mil û basika ku di wê şe va reş ûtarî û

sar da, ew bigihanda miraz û metleba. Ba dikete boriyê soba sar û jengorî û den geki bîna-nî dengê bilûra şivanekî pîr û mandi ku di binê gelyîkî kûrî dûr da miqameki şewat, li nêriyê belhesm ra lêde jê dihat.

Li ber bayê, xulya sar e sobê hêdi hêdi û hindîk hindîk (jî) jor da dirîjiya erde û tozek nerm jê quätz dibû.

Eşkevek (leganek) dârin e lêv eşkestî ku bi sîf rîkek çermî ye pilpili hatibû vepoşan digel satilek zêc e reş e teji av, li quçî di ye xanî, li nêzîki derî dihate xuyan. Di eşkevek da her tenê du deste nanê req û rût û hişk û tîrsî (tîsi) karto (beyat, sar), ku tenê bi-jîva jarêd malê bû, xuya dikir. Satila avê jî li ber sirr û seqemî bêhît bû û telteyek bûza şîn rûyê ava wê vevo şandibû.

Çavêd zitbûyi ye Nêçîrvan pîr li rex soba sike sar bi palasek reş e mezin e gîncir ket ku destek cinivîn li ser dan-abûn. Tiliya wî bê hemdî wî çû ser tetika tu-fengê. Baş bera xu dayê û hêdika pêşda çû. Tîrs û xof ketibû dilê wî. Li ber nîvîna rawesta. Dîna xu dayê du kes tê da razane... Usa di xew ra çûne tu dibêjî mirî ne, yan helk (hîlk) nefesa wan bîrîne. Bi tîrs û lerz, hêdi kujê lihêf jî ser wan rakir û da aliyekî.

Dê û qîzek di bin lihêfek qîlîr û kewn (kevn) û gîncir û kunkunî (qul-qulî) da ji ber serma hişk bûbûn. Lihêf hind gîncirî û pilpili bû, eger meriv tayek jê bikşanda hezar pine yê jê biketa.

Dayîkê qîza xu himêz kiribû, her du destê xu lê werkîribû qepercê kiribû, dabû ber singê xu. Te digot qey xastiye qîza xu di nav dilê xu da cîke û kutatirin germaya leşê xwe berde bedena kiça xu ye şîrîn û xoşdîv. Belengazê ci bike, ceger şîrîn e.

Porêt dayikê yê hişk û zîvr û aloz û vizvizki binanî hêlûna (hêlinâ, lana) xer telek pîr ketibû ser balgiya reşecîl-kin û qîlîrîn. Keziyê qîzê jî hîrîşyabûn rex wan, lê kezikê qîzê binanî destê armû şê (hevirmîş) peng nerm û badayî bûn. Xûsek nerm û nazîk ji xu awitibû serê gulyîye wê ye sorî gevez. Xûsa zulf û keziya li ber ronahiya zere fenerê diçirû sin, yeki nebeledi (nîzanibûna) yê bigota qey xîşir û zêrbîni û guhar û bercenîkê keçikê ne, ku liber serê wê diciivin.

Du hêşir binanî du mirwarîda di ka-niya çavê dê daqerisibûn. Zingê zer û ler edê heta çoka ji derive mabû. Ev her du kesê bêkes li ber sirr û seqemâ zivistanê û reşatiya şevê ketibû xewek kûr, xewa bê şiyari û here hereby, xewa ku avêşa kuled jiyanê û dermanê derde dînyayê û nujdarûya rizgarî li gîrodar û nedarı û jérbariya dunyaya xapxapok (xapinok)

Nêçîrvan pîr (bi) ser wan da xar

Semîyane gel

Elikan Berçem

Şam dûr e qey mişar jî dûr e

Pirsa ji bo rastîyê çewa di beşa ginoceolgîya Marksîst-Leninîst de ciyek merkezî distine, wisa di felsefîn din de jî ciyek girîng digire.

Rastî, xwedîtina hebûna objektîv a di serê mirovan de ye. Heya derekê mirov dikare bibêje, ku rastî xwedîtina herî nêzîk a hebûna objektîv e. Hinék filozof dibêjin, ku ew "kopiya", "resmî" hebûna objektîv a herî çêtirîn e. Lî çewtfîrbûn xwedîtina hebûna objektîv a pûç û bê binî ye. Ji ber ku rastî timî heya, devekê takabûlî objektîv xwe yê naskirî dike, ew rastiya objektîv e. Zanîna li ser objektan a objektîv û rast ev e, ya ku di naveroka wê de subjek-tê naskirinê ji ber xwe ve tiştek nekiriye ser naveroka zanîna li ser objekt, tiştek ku di karekterê objektê naskirinê de nînbe.

Zanîna objektîv û rast tam takabûlî objekta naskirinê dike ya kuji aî subjekta naskirinê ve pêk tê. Rastiya objektîv a naveroka zanîna mirova wisa ye, ku ew ne bi subjekt ve, ne bi mirova ve û bi mirovatîye ve girêdayiye. Lî divê ku mirov objektîvbûna rastiyê û objektîvbûna objekta (tişta) bi hev û din ne guhêze. Zanîna me ya li ser tişta objektîv e, lî tişt bixwe objektîv hene.

Ew tişte we li jor li ser şirovekirina rastîye xwendin, di vê gotina bav û kala de hatiye ser ziman. "Rastî tahl e". "Rastî ne bi qiloç e" Ev gotin di-dine xwîyanîkirin, ku rastî ji derveyî me hemîye heye û ne hewcî qiloça ye. Rastî tahl e" ji ber ku di rastî de kara kedxwar û serdesta nîne. Tenê kara çîn û kesê ji bo pêşveçûnê dişixulin heye. Wek pêşîya gotiye : "Yê rastîye dibêje, wî ji heft gunda diqewrînî."

Rastî çiqas objektîv e, hewqas jî konkret e. Rastî timî konkret e. Rastîya abstrakt nîne. Bi awek din, rastî ne rastîyek tevayî ye. Ew rastiya li ser hinék karekter û girêdana tişta di rewşa wan a berçav de ye. Rastiyeke di rewşina de rastî be, kare di rewşek din de ne rastî be. Ev yek diyalektîka jîndar a di navbera weşê rastîye yê absolut û relativ de dide ber çava. Lewma jî bi serê xwe ye, gava ku mirov dibêje : "Emelê cotar şûva cotar e." an jî "Emelê palevan pişîza pelevan e."

Pîvan ji bo rastî û nerastiya zanîna me ya li ser tişta ci ye ? Mirov dikare vê yeke çewa tespit bike ? Hinék felsefîyan dibêjin ji bo ku zanîn rast be, divê ku ew "zalal û berçav" be, hinék jî dibêjin, divê ku ew "ji terefê hemî kesî ve bêt qebûl kirin", hinékîn din jî dibêjin, divê ku "fêda wan hebe", h w d. Lî ev dîtin hemî jî ne rast in, ew nikarin bibin krîterê bingehîn ji bo tespitkirina rastî û nerastiya zanînî li ser tişta. Krîterê herî bingehîn ji bo vê yekê, prakfîka mirova ye. Di warê prakfîka de kifş dibe, ka gelo zanîn li ser tişta rast e an jî çewt e, her çiqas ku prakfîka mirov girêdayî hoyen dîrokî yê konkret be jî. "Vireke xwe bike, şahidekî xwe rake."

Ev yek di vê pêşîgotina bav û kala de jî hanê hâtiye ser ziman : "Dibêjin yekî got, min li Şamî, di ser heft mişaran re qevastiye. Yê din gotê, Şam dûr e, qey mişar jî dûr e. Fermo va ye bîstan!"

(xwar) bû, ew hejandin. Lî bê ci nebû xof û tîrsa mirinê di dilê wî ye pîr da hêlûn kir. xanîyê teng û tarî jê ra bû mala merg û mirin û reşê şevê û cinawira. Reşati û sirr û seqemâ şevê li derive û dêwê merg jî di hundur da jor û der û diwarê malê di nav çeng û lekmê xwe da asê kiribûn. Nêçîrvan pîr ji ber xofa merg û mirinê di wê demê da ku çokêd wi dilerizîn û ricaf ketibû dilê wî, derkete derva. Ewî sirr û seqem ji mirinê çêtir zani. Lî li ber derê xanî çavêd gura ku çavnihîrî wî bûn di tarîye da diçirûsin û zûrre zûrra gura hevo û fire-tê bîr û hîzred wî pijirand. Dengê gullê Nêçîrvan têkeli dengê gura bû û di-reşatiye şevê da deng vedan. Gurged bîrsî nikarn dest ji nêçîra xu bîkşîn, hîris danê û ew di nav hev da girtin.

helbest helbest helbest helbest helbest helbest helbest helbest

Ji Şêrko Bêkes

Diyarî

Ke tişkit girt û pêtnûsi
Xor dête lat û be diyarî
Kitêbêkit pêşkeş eka !
Ke şepolîst xwêndewe
Aw dê û ciwantirin rûbarî
Kiçî xoyt pêşkeş eka !
Ke ewînî hejaranîş lenaw
dilta helgîrsêni
Paşeroj dê û bextiyariy
Em zemînet pêşkeş eka.

Xîşil

Dêrzamanê gêrayewe:
Şî'rê xoy barkird le xişlî,
Jinî sultan
Roj roy.. roj hat
Katê ke jini sultan mird
Leser fermayıştı sultan
Jin û
Xîşil û
Şî'rekeyan
Pêkewe naş!

Xak

Destim bird bo-çill-i darê
Le taw azar -liq- daçillekî
Ke destim bird bo lîqeke
- Nawqed- i dar kewte hewar
Ke bawesim kird be qed da
Xak leriyewe le jêr pêmda
Berd nalandî
Emcareyan ke danewiyim
Xolim helgirt
Gişt Kurdistan zirikanî !

Bala

Azarêkî bala berzim
Bê ewey biçme serşanî
xemekîtir
Tenha beser helbirrînê
Birîn le kuwê bê eybînim
Hejar le kuwê bê emb

Kursî

Ew kursiyey şâ'irekeyan
Le-ser kuşt
Şayetek bû
'Hênde jiya
Ta mergî celladî bînî û
Ta azadî leser danış!

Lafaw

Lafaw be masigirî wut:
Hoy tûrrebûnî lêşawim
Gelê zore
Belam hoy here gewreyan
Leber serbestî masiye û
Dijî tore !

◆ Helbestên Xwendevanan ◆

EM JÎ...

Em jî
bi dinyayê ketin,

Wek her
miletê bindest.

Hem şiyar bûn,
û hem jî winda.

Însana em nas kirin,
Û me jî dinya.

Lê kî bû bi me keniya,
em ji hev re kirin
dijmin?

Em tu car ji xwe ve
fêr nabin,
nas nakin dîroka xwe.

Kal û bava gotiye,
Ê ku bi ser hatiye

Tang û top û firoke,
ne bese ji bona me.

Şêro, Mişko û Hirço,
bi ser nakevin tu car.

Divê dijmin nas bikin,
bi serîkî şer bikin.

Me ne bihîstiye hê,
navê yekîtiya we?

Yekîti bo xelasî,
êdî paşê derbasî!

Lo Birano

Lo birano lo birano lo birano!
Em Kurd in egîten serê çiyane, lo em dinalin
Em hatine welatê xelkê lo radikevin
Bi quruş û alikariya wan em çav dignin
Hewar hewar ji derdê xelqê me, em şewitîn

Êdî bese yekîti çêkin lo em tev herin
Şer serê xelasbûnê lo bi mérani
Hewqas şehîd xwîn rijandin lo bi mérani
Xwîna me qey ji xwîna wan şîrîntir e, em jî herin
Hewar hewar ji derdê xelqê me, em şewitîn.

Zinar-Almanya Federal

MIROV

Kaniya Reza

Ne şêx in em jehrê bidin miridan
Ne sofî ne di halet da bikevî cezban
Ne Misilman in em ne jî Xiristiyen
Mirov in ji mirov baweran, di mirov evînan

Em ji çêkerê dînan vê carê di xerabkeran
Em ji wan in ê dîrokê bi destê xwe çêdîkin
Em ji proleteran, avakerên sibehêñ xweş in
Mirov in, di mirov baweran, ji mirov evînan

Ne hov in em ne jî di canawirê
mirovan didaqurtînin
Ne qral in ne qralparêz ne jî di sinifê wan in
Ne se ê qenc in jî tîkvegir in bo her ê ku dibînin
Mirov in, ji mirov baweran, ji mirov evînan.

Çima ?

Ev serşevîn,
'Ewrik çima sor dixwanê;
ne ku xweyne bi kelekel
yan giloktelp çima berggevjin;
ne ku terivandina sayîye
Herê, stêrk çima xeyîdîne,
ne ku "hesarketin" heye.
Yan çima stran bêxwediye
ne warqewirandina sosina ye
Û ev serşeva weki hergav
Hîvik çima qaçıl girtiye;
ne ku me "çeleng" hunda kir,
yan serkeş çima dizirtike
ne ku dayik pêxwas dilorîne.
Herê, hertişt hate famkirin;
Lê kijan mîr û xatûn dikare bibêje
dayika min bi zewaca nûra
nefsnesaxî namîne!
Ger ku heqê yekî awa
li anîka wî
"Di paşila dayika min de raketîye"
dinivîse
wextêñ ku
bavê min li seyr û bala şevînê bû.

S. Farqîn/ Entab

Xendevanên Hêja !

Gelek helbestên we dighêñ destêñ me. Em bi
viya këfxwêş dibin, lê ci feyde ciyê me dest
nade ku em hemûyan çap bikin. Carna, hin
helbestan her çiqas em dixwazin çap bikin
jî, em ji destnîvîsên helbestvanên xwe yê
nuh fêm nakin. Em li jor çend helbestên
xwendevanan bê guhrandin diweşînin

DERSİM RA

Arêkerdox: Usxan

Meyitê Ma

Saxseg ra hîre hevalî sonê(şonê) Xoloj komir vêsnenê. Kunê lîl Medet vano:

-Birayênenê, bêrê tika şîme dewe, çê(key) Qemer'î ama Qemer cina xo ra terseno, ma rê nû(nan) niyano.

Hevalê bînî qewul kenê, darînê we sonê dewe. Niyadanê ke Qemer ha wo verê dewe de cite keno. We'lî vano:

-Qemer ma ve(bi) xêr meymen qewul kena? Ma gêste(gês) de) merdme. Ala şîme dewe pîzê ma mird ke.

Qemer vano: -Birayênenê, sima zanêne cina mi keş(kes) rê nû nîyanâma Weli ke pê bixapno belka sima rê nû ana.

Qemer na hîrê hevalû cêno sonê çe. Nisenê ro, hal-xatir pers kenê. Cina Qemerî kî kose dote de nista rû qeytan xo ro sik nêna. Na hîrê

hevalî nîyadanê ke cinike ra veng nîvejîno. Qemer çim sîkneno ra Welî. Welî vano:

-Axxx... ax Wuşen Axa! Wuşen Axa mordemode pîl vi(bi), piyê feqîrû vi, meymen vêsa(veyşan) nêverdênê (Wuşan Axa vistewrê Qemer'î yo).

Cutir ki Welî hêñ(wina, ena) vano, Xatûna Qemer'î urzena ra (werzena) pay. Welî vano:

-Wuşen Axa wayirê miletê Kirmanciye vî. Qesê xo zern, sukuê xo şêm(sêm) vî.

Katuna Qemer'î sona bonê çêyî, pêro piya huyînê. Qemer vano:

-Sima(şima) ça mehuyê, Haqî sima rê beçike este we.

Xeylê qesey kenê xecelînê, nîyadanê ke Xatune şenîya(sînîya) pile şîr* poto, ard horte de nê ro. Şîrê xo wenê, doyê xo simenê(şîmenê), Welî vano:

-Bira Qemer, zonena? Wuşen Axa weşîya xo de ma werdme qed-ênayme. Nika kî(zî) leyê mezelûnê ma de dardo we, nika kî meyitûnê ma weno kutiko murdar!

Cutir ki hen vano, Xatune bena ve kirşî ro, Welî çever de beno tever. Îyê bîn kî jû pencere ra, jû quilikra remenê. Xatune taye mil-qî kena(nengî çînena), leyê xo de kirşî dana ve qafika Qemer ro, gon tiro kena war. Hîre hevalî remenê sonê çê muxtarî ra vanê hal-mezal (hal-mesela) niya niya. Huyayîş (wayîs, hiwayîş) di mirenê ginêne hard ro.

Muxtar vano: -Bira Welî, qedayê fekê tû bijerîne, tû rind kero. Aye na dewe de ma werdme.

Tarîxê nuştişî: 1981
*Şîr: Dersîm di namey yew werd (wer)'î yo.

Hewla

Saxseg ra mordemê(merdimê) beno, hewla(helwa) ra zaf heske-no. Namê na mordemî Silema beno. Cûnû(ciwenan) ke danê we, hekîn roseno(roşeno), perû cêno (gêno) sono Dersîm loqante. Mawade teke de niseno rû. Xizmek-ar(garson) yeno, Silema vano:

-Ero mi rê hewla bîya!

Xizmekar sono tosê(tasê) hewla ve nonê ra cêno yêno. Silema vano:

-Biko, eke bese kena mi rê hewla ve qutî ya bîya.

Xizmekar sono qutîya hewla cêno ano verê Silêmanî de nano rû. Hîre kî nonê somî birneno ano. Silema kuno ra ci, nû ve hewla ra weno, qedênenô; urzeno

ra perûnê non û hewla dano, çever de beno tever. Hernêñ(erînayîş)a xo keno, kuno ra raye sono dewe. Raye ra beno têsa(teyşan), yeno heniyê Derê Kemerê Kung de uwa (awa) xo simeno, kuno ra raye. Tenêna sono, onça beno têsa. Xo çarneno ra Oxnîye. Sono Oxnîye de uwa xo simeno, onça kuno ra raye sono. Onça beno têsa. Heta yeno Keysûn ke têste(tês de) mireno, zor xo erzeno henî ser. Sarê xo fino de golê henî, uwa xo simeno, kuno ra raye. Hortê Keysûn û Saxseg oroj ya. Silema hata oroj yo vejîno ser ke araq pônî ri sono. Üza ra cêr hem vozeno hem gir beno, yêno Heniyê Qale Sipey. Uwa cirne serdin a, uwe si-

meno; yêno çê, çêver de zirçeno, vano:

-Fatê, mi rê uwe bîya!

Fate vana: -Nê lawo lawo, tû ya hetê cirne ra yêna, tu ça uwa xo nêsimite?

Sil(Sileman) vano: -Erê mi rê uwe bîya, ez têste merdnîye!

Fate çapê uwe ana, aye ke sime-no, gineno cile ro, hot(hewt) rojî cile de maneno. Hot rojî ra tepîya yêno ra xo, vano:

-EZ ke reyna hewla wen nêzan çik çik borîne!

Tove(tewbe) keno, reyna hewla nêweno.

Tarîxê nuştişî: 1986

Meseley Nomis

Arêkerdox: Mihê 'Elîşanî

-Dest mi ardin ê, wa pêş mi ardî nêbî. Hela bê pêşê mi bid' qayme.

Mérde pêşon ya don' qayme û girê don'. Cenî şîna war, ber akena, ewnêna kuçe, vînena yew ha vêren'. Veyn dana mîrik', vona:

-Bê!

Mîriko xerîb agêren' yen', cenî destê yî gêna, bêna axur. Tira vona:

-Mi di gure bik!

Mîrik gurey xu ken', qednen'. Cenî ber akena, yî kena kuçe. Tira vona:

-To r' axiri b'!

Mîrik şîn', cenî şîna cor veyn dena mîrdey xu, tira vona:

-Mérde, yew ome nomis mi û gurey xu kerd,

şî. To z' yî r' pêşê mi day qayme.

Reng' mîrdey şîn', cenî ra von':

-Heqê to esto, ez neheq o. Yew nîeşken no-

mis' yew bipaw.

Malmîsanij

GANAWIR

May mayê ki ehendi zaf ma sînenê ewro roj bi pinanî dirnenê, veşnenê kitabanê ma. Cenî mayê bêçarey ma şîret kenê, şermî reydi qestikî: "Hagîdarê xo bi se beno?"

Avendedê xo ra vindere!" Embazî vanê

filankes xo nêkeno kutîş ra, bêvankes hewl o heta darb wardîş ra.

Hin biyo ki ewro

hewley, pey bi kutîş peymawiyêna hinî, hin kerdo ki zaliman kamî ki zaf darb ward û çew nêda dest ayo camêrd o ewta.

Kenê ki nişka, newe ra dinya ageyrnê peyser. Ma vajî ki dinya vindernay, dinya ko senê şero peyser nêvanê?

Ê, seserra vîstini di merdimey ra teber hêş û zanayîş ra vete.

Ma, xortê İspartaya Verîni.

De bê meşermaye, bê ewroy ver mekuwe leyro, de bê ha...

Bivîne nî ganawirî, û de bê nengan meçîne bider, bê gaman meerze aver!

WETENDAŞ

Marda xo ra biyayîşê ma ci bi ki rojê yewinê menga verêna serri? Ti zî zanî ki

"cuzdan"ê ma qestikîn, "soyad"î ma zurayê.

Ma key benîm wetendaş

Io wetendaş?

Ê hewt bî, ma vîst û hewt bî

Arêkerdox: Koyo Berz

Wextê di, o verdê roy a dewê di, di teney berî('esiri) benê. Nê wirna berî pê di lej kenê, rojê hetan şan tifingan a erzene pê.

Bera jû hewt merdimî benê, bera bîni vîst û hewt benê. Nê pê ser ra zey yaxerî(varanî) qurşûnî varnenê. Bera ki hewt merdimî yê ïnan ra kes nêmireno, bera ki vîst û hewt merdimî yê ïnan ra vîst merdim kîşyêno. Beno şan, lejî terk kenê, yenê keyandê xo. Bera ki vîst û hewt merdimî bêna, ray o raşte merdimêde xerîbi yena. Merdimo xerîb ïnan ra pers keno, vano:

-Lej senî bî, şîma se kerd? Şîma ra çend merdimî merdê, ïnan ra çend merdimî merdê?

Jewdê vîst û hewtan vano ki:

-Ma vîst û hewt bî, ê hewt bî. Ma eşt ïnan eşt, ma eşt ïnan eşt; ma eşt jew vîst, ïnan eşt jew vîst; ma eşt ïnan ra kiş, ïnan eşt ma ra kiş; ma kişte ïnan kişte, ma vîst ïnan vîst... en bahdo ma mendê hewt, ê mendê hewt kesi. Lejê ma bol çetin ravêrd, ma zey pê amey!

Roco ra rocêk yew cenî w yew mîrde ben'. Meseley Nomis ser kon' minaçşe. Mîrde, cenî temî ken', von':

-Ti gerek teber ra nêgeyra, kîye ra nêvecya.

Ü von':

-Camêrd nêb' se nomis cenîyo çînkew!

Cenî z' mîrdey xu ra vona: -Yew nê eşken' no mis' yew bipaw! Nomisîyê w bênomusey dest' merdumo da. Nomis herkesi z' dest' yî de w.

En vatey cenî ser' mîrde hêrs ben' û ceney xu ra von':

-Ez nêbo, nomis' to çînkew!

Cenî z' hêrs bêna, mîrdey ra vona: -Bê ma şertêk bikerê?

Mîrde cenî ra von': -Ma çinay ser' şert bikerê?

Cenî vona: -Şert' ma wa en' seri bo, vatey ma kom' raştı bo se ma yew vatey yew qebul ken'.

Mîrde von': -Wa bû.

Cenî hema warzena ardî dekena taşt, veyn dena mîrde, tira vona:

Ji xwendevanan

"Îslamê ji eslê wê hîn bikin"

Her ku kovara Armanc derketiye ez dixweynim. Kovara we ji ber ku bi zimanê Kurdî dertê gelek baş e. Lî belê di naveroka xwe de ne wekî ku armanca pêsi- ya Armancê ye. We li ser rojnamê (kovar) nivîsiye Serxwebûn-Demokrasi-Sosyalîzm. Awê ku min Marksîzm xwendiyê dibêje ku : "Hîmê Komunîzmê li ser bingeha ilim hatiye danîn" Anglo, Marksîzm tehlileke ilmî ye.

Em werin mesela bin gehîn. Di hejmara 78'an de Lawikê Berrîvanî meqaleyek nivîsiye. Di nivîsa xwe de tiştên ne rast gotiye. Awê ku ew dibêje, berê misilman bûye. Lî pişt ra bûye kafir. Anglo bûye bê iman. Edî baweriya xwe bi İslâmey nayne, beweriya xwe bi komunîzm tîne. Komunîzm

îçar ez ji redaksîyon A-

jî baweriye ilmî ye. Berriyanî dibêje: "Qurana Mihemed" kesen kafir dema neyên ser dinê heq "qetla" wan helal dike. Ez dikarim bi wê "Qurana Mihemed" sond bixum ku Lawikê Berrîvanî ne rast dibêje. Û ez dîsa dikarim sond bixum ku Berrîvanî yek herfek Quranê jî nexwendiye. Ji ber ku Quranê tu negoziye ên ku nebin misilman qetla wan helal e. Ev jî dide nîşandan ku Berrîvanî ji ber xwe va tiştan dibêje. Ew belkû xwe Marksîst dihesibîne. Lî belê ew ne wulo ye, Marksîzm dibêje berê bixwîne hê hukum bide. Divê ku Berrîvanî, dema mesela ku tehlîl kir, bira baş lê bikole, rastî u nerastiyê derxe ortê; ne ku tiştên bê ilm u ne rast dibêje...

Di rojnama xwe de jî piçek behsa ola gelê xwe (ku niha ji sedî 99 Misil-

mancê re dibêjim: Ev nerasiyen ku wulo têr nivîsin di bin destê we re derbas dibin. Ev jî dide nîşan- dan, hûn jî bi gotina Berrîvanî re ne, heta ku wulo be hûn jî di çewtiyê de bin, xwe rast bikin ! (bi biratî) Ev tiştên wulo ne rast, qîmeta Arman- cê hunda dike. Bira çewtiyên wulo çenebin, ev ji jiyana ilim re derbeyek mezin e. Ez hêvîdarim ev gotara min di nav rûpelân Armancê de bê belav kirin. Û heke hûn bê alî xebatên Armancê ji bo gelê Kurd bido- mînin, divê ku hûn gotina "Sosyalîzm" ji ser kovarê rakin. Şaş teneğihîjin, ez bi xwe ne kapita- list im. Ez Misilman im u min baweriya xwe bi İslâmey anîye.

Bimînin di xweşiyê de!

Veysi Ulus/Fransa

Li ser vêya polis êrisi meşvanan kir u di navbera polis u meşvanan de şer derket. Polis zêdeyî 20'kesi girtin.

Li Stembolê roja 1'ê Gulanê nezî 5 hezar kesi ji çar aliye bajê hereketê meydana Teqsîmê kirin. Di nav vê kîtleyê(bos) de 8 parlamentê SHP'ê Abdulla Baştürk ji bo rojnamê Tirk û biyanîyan preskonferans çekir. A. Baştürk di preskonferansê de got "Hukû-

Dûmahiika Xeberan

Mehmet Şîrîn Tekîn hat...

xwendevanî kuştina Şîrîn protesto kîrin û şîrân wek, "Mehmet Şîrîn namirin", "Ji qatîlîn faşîst wê hesab bê pirsîn" bilind kîrin.

Li izmîre li Unîversîta Egeyê û Unîversîta Neh Îlonê xwendevanî xwarin boykot kîrin û ji bo bîranîna Şîrîn deqekê bêdeng rawestiyân. Li Edenê xwendevanî Unîversîta Çukurovayê li dor 500 xwendevanî wan jî xwa-rin boykot kîr û ji bo bîranîna Şîrîn deqekê bêdeng rawestiyân.

Li Enquerê li Unîversîta Teknîkî ya Rojhelata Navîn, Unîversîta Gazî, Fakulta Zanyariyê Siyâsî, Fakulta Huqûqê û Fakulta Ziman, Coxrafya û Tarixê cihê cihê lê 'eynî seetê tevgeren têvel çekirin, xwarin boyqot kîrin, deqekê ji bo Mehmet Şîrîn hat rawestandin. Tevgera girseyî ya li ber Fakulta Huqûqê bû. Xwendevanî Fakulta Zanyariyê Perwerdekirinê û Fakulta Huqûqê gîhiştin hev û bi dengekî bilind slogan avîtin, "Mehmet Şîrîn namirin", "Wê heyfa wî bê stendin", "Bimre Faşîzm" û h.w.d.

1'ê Gulanê hat pîroz...

çar aliye meydana Teqsîmê bariqat danibû lema jî di navwan u meşvanan de şer derket û ev şer bi seetan ajot.

Ji ber ku tenê imîtiyaza parlementeran tenê hebû lema jî ew tenê ketin meydanê û ji bo bi bîranîna 34 şehîden ku di sala 1977'an 1'ê Gulanê de ji alî dijiminê ku nedixwestin ev cejn bê pîroz

kirin de hatibûn kuştin, tacegul danîn. Pişti vê, parlamentê SHP'ê û sorokê sendika DîSK'ê Abdullah Baştürk ji bo rojnamê Tirk û biyanîyan preskonferans çekir. A. Baştürk di preskonferansê de got "Hukû-

Bakurofe

dan u niveka esmana hate xuyan, ester lep lep bûbûn u dicilvilin, hewa ber bi safibûnê dicû. Geli binanî miriyekî kefensirî cil u kever bûbû.

Sibetira wê şevê, şivana hestikêd leşê sê kesa li dev dorê wê male ditin.

Girtiyen siyasi bi qerardarî...

bala raya giştî bikşînîn ser hefsî, li ber belediya Diyarbekir xwe şewitandin. Lî xelkê ew xelas kîrin û nehêş tin bişewitin. Polis di dêlî

Belavoka Komîta Berxwedana...

wê bikevin halekî wisa, ku fonksiyona xwe ya tarixî û wê sebebê hebûna xwe jî înkâr bikin. Komîte dide eş-kerekirin, ku ew ji ber vê yekê û neheqiyen li ser xwe rakin bîrîvara grewa birçibûnê stendine.

Girtiyen hefsa sivîl

tiyan jî bi serfirazî dev ji grewê berdan. Li gor xebren tê, diben 6 girtî nexweşen giran in.

11. 4. 1988: Mirovên girtiyen çûn cem Waliyê Diyarbekir Hemdi Ardali. H. Ardali got ev ne karê min e.

12. 4. 1988: Baroya Diyarbekir ji Yuçel Onen, Mustafa Ozer, Mehmet Kahraman, Cemşit Bilek û Sezgin Tanrikulu komîtek ava kîrin û çûn hefsî. Li ser navê girtiyen berpîrsyaran berxwedanê Harûn Efe û Selanik Onen bi heyeta Baroyê re axiftin. Mudûrî Hefsî got bêyî lixwekirina kîncen yek babet yê hefsî, em hazirin hemû daxwazên girtiyen qebûl bikin. Harûn Efe û S. Onen gotin heta hemû mafîn me neyê qebûlîrin emê berxwedana xwe bidomînin.


13. 4. 1988: Mirovên gir-

kasyonê Li ser viya mirovên girtiyen hêrs bûn, ji wan hinekan kevir avêtin bînaya Adiliyê. Polis 25'e wî jin, 27 kes girt avêt nezaretê. Mirovên girtiyen hefsa eskerî jî çûn alîkariya mirovên girtiyen hefsa sivil ku di grewê de bûn. Hefsâ eskerî bîrîvara 2 roj grewa piştgiriyê stend.

19. 4. 1988: Ji SHP'a Diyarbekir jî 48 kes ketin grewa piştgiriyê. Sendîqa Yol-İş û Petrol-İş piştgiriyâ xwe dan diyarkirin.

20. 4. 1988: Mirovên girtiyen, ku hatibûn girtin, mahkemê ew berdan. Mu dûrê hefsî da diyarkirin ku ew hemû mafîn girtiyen qebûl dîkin.

Xacepîrs




Ceperast: 1-a) Qû wet b- Navê romana bi nav û deng a Tolstoy 2-a) Derman, İlâç, "rê" (berevajî). b- Na- vê rojnameke Kurdî. 3-a) Recifîn b- Dîn, ayîn. 4-a) Li Bahdînan ji bo "pî- ne" yan tê gotin (berevajî) b- Xezal (berevajî). 5-a) Nivîskarekî Kurd ku bi navê "Hêsisir û Baran" Stockholmê te ci dîtiye bêje" du kitabê wî çap bûne. b- Li devera Botan ji "hi- narok" an re dibêjin. 6-a) Ne guneh (berevajî) b- Di Kurmancîya jêrî de, daçek. 7-a) Di Kurmancîya jorî de pronavek. b- Meqam. 8-a) Rengek b- Derd, xem, kul û kovan. 9-a) Şekil, terz. b- Dayîk. c- Xwarineke Kur- dî. 10-a) Bi şev birina pez çêrê. b- Kesê aqilê wî ne temam, aqîsivik. 11-a) Bi Kurmancîya jêrî, "daxwaz". b- Bêvil, difin (berevajî). 12-a) Kewal, terz. b- Jina ku pez di doşê. c- Xwarineke heywanan.

Bersîva hejmara berê

Ceperast: 1- Xanêlep zêrîn. 2- a) Amade, b) Reşo. 3- a) Jîr. b) Yezdin. 4- a) Ar. b) Al. c) Vîze. 5- a) Ya- sa. b) Ap. c) Rî. 6- a) Dr. b) Na. c) Anîn. 7- a) Hêvi. b) Sor. 8- a) Serçawe. b) Rû. 9- a) Nr. b) Ra. c) Şo- xê. 10- a) AA. b) Çi. c) Ro. d) Hk. 11- a) Behr. b) Èn. c) Kanî. 12- a) Ol. b) Se. c) Narîn

Serejér: 1- a) Xaran. b) Hejar. 2- a) Amîr. b) Dêw. c) Aho. 3- a) Jan. b) Arvan. c) Le. 4- a) Dê. b) As. c) Birçi. 5- Leylan. 6- a) Yaser. b) Ne. 7- a) Pizo. b) Aso. 8- Par 9- a) Èrivan. b) Akrêy. 10- a) Renî. b) În. c) Ar. 11- a) Îş. b) Zîn. c) Rohnî 12- a) Noker. b) Pûşkin

Cî li siyonîzmê teng dibe



Di meha Nisanê û destpêka Gulanê de dîsa pirsa Filistîn bi puntoyên gir di rûpelên pêşin ên rojname û kovarên hemû welatan de xwe derxist pêş. Televizyon û radyo yan xeber û komentarên xwe yê yekemîn ji mesela Filistîn re veqetandin: Ebû Cihad (Xelîl El-Wezîr) ji aliyê Îsraîl ve li mala xwe ya li Tunusê hat kûştin; û liberxwedana gelê Filistîn a li erdên îşxalkirf bilindir bû. Ebû Cihad yek ji dameznîrê El-Fetih û RRF (Rêxistina Rizgariya Filistîn) û di dû Yaser Arafat re mirovê duduva yê têkoşîna gelê Filistîn bû.

Kuştina Ebû Cihad diyar kir, ku Îsraîl dîsa bi taktîkên xwe ên terorîstî dixwaze pirsa Filistîn "çareser" bike. Lê ne bi hêviya wek berê. Lewra, êdî wan jî fêm kiriye ku bi van taktikan ev pirs "çareser" nabe, lê riyan demokratik, helkirinê adil jî ji menfe'eta wan û xeyalên siyonîstan ra rast nayê. Ji ber vê çendê "tedbîr" û

taktîkên terorîstî ji xwe re rêya herî maqûl û çê dibînin.

Dewleta Îsraîl bi kuştina Ebû Cihad di hesiband ku wê pêşî li ber serihildana gelê Filistîn, ku hîn jî li erdên îşxalkirf dom dike, bigire. Lê tiştê siyonîstan dipa nebû, eksê wê bû.

Roja gelê Filistîn xebera ne xwes û resbihist daket kolanan. Di destêwan de sûretê Ebû Cihad û ala Filistîn bi kîn û nefretek bêtârif li Gaza, li Şerîa Rojava, li Nablûs, Ramela, Yafa, Qudûs û li her bajarê gelê Filistîn lê dijiya meşîyan, bi keviran çûn ser tanq û silehîn modern. Bi dehan laşen xortê Filistîn li kuçan dirêj bûn, yên ji wan piçûktir di ser laşen bîrayên xwe de qebaz didan, kevirêni de destêwan xwe de bi kezebsawîti divirvirandin siyonîstan. Sûretê Ebû Cihadê şehîd ruh û cesaret dida meşvanan. Îsraîl di şûna ku ji quncik xelas bibe, hîn jî di quncik de asê bû, bi dîwar ve zeliqî.

Li derveyî Filistîn, rêxistinê siyasi yê Filistîn hîn jî nêzikî hev bûn. Di zemanekî kurt de, meclisa Filistîn ku organa herî bilind a gelê Filistîn e wê bicive. Ji ber gelşen ku di nav rêxistin de heye, meclis ji zû de ve ye nediciviya.

Li Îsraîl, xelk êdî ji demagojiyên rejima siyonîst bawer na. Xelk li diji terorîzma ku dewlet dimeşîne derdikeye.

Bi kuştina Ebû Cihad û terorîzma ku tê meşandin Îsraîl ne tenê li hundirê welat, her wisa li derveyî welat, li hember raya giştî ya dinê jî cî lê teng bû. Ci bêje hemû dînyayê Îsraîl protesto kir. Gelek dewletên emperyalist ên Ewrûpî jî li hember kirinê Îsraîl, bi nermikî be jî dengê xwe derxistin. Sûriye û RRF pişî 4 salan li hev hatin. Vê yekê pêşverû û dij-emperyalistên herêmê xurtir kir.

Her diçe cî li siyonîzmê tengir û têkoşîna gelê Filistîn jî xurttir dibe. □

Jiyanek ku bi têkoşîna tarîxa miletekî ve girêdayî.

Hin kadirê şoresger hene ku bi tunebûna wan valeyyîk peyda dibe. Ji ber vê çendê jî zû bi zû nayên jibirkirin. Hin kes jî hene ku di her şoreşekê û di her şerî rizgariya neteweki de hejmara wan qandi tiliyê desteki ne, stûna şoreşê û tevgerê ne. Jiyana wan û tarîxa wê şoreşê an tevgerê bi hev re girêdayî ye, bêyi wan tarêx nayê izah kirin. Wek Xelîl El-Wezîr. Bi navê xwe yi ku tê naskirin Ebû Cihad. Lî jiyana Ebû Cihad ne bes tenê tarîxa El-Fetih û Rêxistina Rizgariya Filistîn e, her wisa tarîxa têkoşîna gelê Filistîn a li diji Siyonîzma Îsraîl e jî.

Ebû Cihad di 1935'a de li Ramlehê ji dayik bûye. Hê 13 sali bû, malbata wî li hember teror û tadeyiya Siyo nîstan bar kirin Gazayê. Ev hedise her dem wek bûyerek teze di bîra Ebû Cihad de bû. Wî digot "biryara barkirinê bavê min wan stendin, ez biçuk bûm, ji ber vê yekê tu gunê min tuneye". Ebû Cihad di 1953'ya de ji xortan li diji siyonîzmê rêxistinêk ava kir. Vê rêxistinê li diji dezgeh û muesesên Siyonîstan sabotaja dikir. Li ser vê yekê di 1951'a de Ebû cihad hat girtin. Pişî ji hefsê derket cû Suudi Arabistan û dûre jî çû Kuveytê. Di vê navberê de wî û Yaser Arafat hevûdu naskirin. Di 1959'a de rêxistina El-Fetih'e damezrandin. Di sala 1964'a de jî Rêxistina Rizgariya Filistîn damezrandin. Ebû Cihad ji wê demê û heta nefesa xwe ya dawî, li diji Îsraîl di hemû erîş û berxwedanên gelê Filistîn de bi biryar û pratîka xwe cî girt. Di herba 1973 ya dewletên Ereb û Îsraîl de hebû.

Ew, di rojên giran, di berxwedanên mezin yê gelê Filistîn de hebû. Wek 1971'ê Ilona Reş li Urdun, 1976 Tel El-Zaatar, îşxala Îsraîl a 1982'ya Beyrûdê, 1983 Trablûs. Ebû Cihad organizatörê yekemin yê berxwedana gelê Filistîn e, ku pênc-şes meh e li erdên îşxalkirf dom dike.

Terora Îsraîl a li diji berpirsyar û kadirê Filistînî

Çi demê doza Filistîn bê rastê, Îsraîl, temsîdar û gelê Filistîn bi terorîstî iham dike. Lê bûyer û pirêzên li rastê gelek car daye nîşan dan ku Îsraîl dewletek yek ji wan dewlet û rêxistinê herî terorîst e. Terorîzma Îsraîl tu hudût û qanûnan nas nake. Erîşa Îsraîl a Entebe, ya Baxdat, a Tûnis, hê jî di bîra her kesî de ye. Îsraîl ji xwe re Lubnanê wek axur dizane; ci car kîfa siyonîstan bixwaze îşxal dike, ci car bixwaze bi teyaran toz û dûmanê di ser bajaran re radike. Kirinê Îsraîl yê nedîtî ji însanîyetê gelek dûr hê jî li erdên îşxalkirf yê Filistîn dom dike. Ev lîsta jêrin, terorîzma dewletî ya navnetewî ya Îsraîl ku li dij temsîdarên gelê Filistîn bikar aniye dide xuyakirin.

1- Hasan Kanafanî (Nivîskar): Di 1972'ya de li Beyrûdê hate kuştin.

2- Wael Zevîter (temsîdarê RRF (Rêxistina Rizgariya Filistîn) û Ro-

mayê) di 1972'ya de li Romayê hat kuştin.

3- Dr. Mahmût El-Hemserî (temsîdarê RRF ê Parîsê) di 1972'ya de li Parîsê hat kuştin.

4- Huseyîn N. Ebû Xêr (temsîdarê RRF ê Lefkoşe) di 1973'ya de li Lefkoşe hat kuştin.

5- Dr. Basîl Kubelsî (Profesor, di Universîta Amerîka ya li Beyrûdê de dixebitî) di 1973'ya de li Parîsê hat kuştin.

6- Mehemed Ebû Diya (Profesor, di Universîta Amerîka ya li Beyrûdê de dixebitî) di 1973'ya de li Parîsê hat kuştin.

7- Ahmed Bushîkî (Profesorê Universîta Amerîka ya li Beyrûdê) di 1973'ya de li Norveçê hat kuştin.

8- Kemal Nasir (Endamê Komîta Rêvebir a RRF) di 1973'ya de hat kuştin.

9- Muhammed Yusif El-Naccar (En-

damê Rêvebir a RRF) di 1973'ya de hat kuştin.

10- Kemal Odvan (Endamê Komîta Rêvebir a El-Fetih) di 1973'ya de hat kuştin.

11- Muhammed Welîd Salih (temsîdarê RRF yê Parîsê) di 1977'an de li Parîsê hat kuştin.

12- Saîd Hemmamî (temsîdarê RRF yê Londonê) di 1978'an de li Londonê hat kuştin.

13- 'Elî Nasir Yasîn (temsîdarê RRF ê Kuveytê) di 1978'an de li Kuveytê hat kuştin.

14- 'Elî Hesen Selameh (Berpirsyarek Ewlekarî yê RRF) di 1978'an de li Beyrûdê hat kuştin.

15- Ebû Sefat (berpirsyarek El-Fetih'ê) di 1979'an de li Qibrîsê hat kuştin.

16- Samîr Tukan (berpirsyarek El-Fetih'ê) di 1979'an de li Qibrîsê hat kuştin.

17- Naîm Qadir (temsîdarê RRF yê Brukselê) di 1981'an de li Brukselê hat kuştin.

18- Macîd Ebû Şera (Endamê Komîta Merkezi ya El-Fetih) di 1982'ya de li Romayê hat kuştin.

19- Muhammed İsa Qeddûmî (berpirsyarek Yekîtiya Xwendevanê Filistînî) di 1982'an de li Enquerê hat kuştin.

20- Nazîh Mater di 1982'ya de hat kuştin.

21- Cemîl Ebû Ruh (berpirsyarek RRF) di 1983'ya de li Atînayê hat kuştin.

22- Bagadan Mamun Mureîs (berpirsyarek RRF) di 1983'ya de li Atînayê hat kuştin.

23- Albay İsmâîl Derwêş (berpirsyarek RRF) di 1984'an de li Romayê hat kuştin.

24- General Muhtir Ebû Xazalî di 1986'an de li Atînayê hat kuştin.